

ROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



14
1986

NAVEROK

Jı xwendevanan.....	3
Hozanê rapervan Cigerxwin û kovara Hawarê.....	4
Hevpeyvin - MUSELIYANA.....	9
Helbest - GUNDÎ.....	10
YILMAZ GNEY.....	11
Jı nav edebiyata kurdi ya klasiki -	
MELAYÊ CİZİRÎ.....	12
Şerê Espanyayê hundırı.....	14
Daxwaza mirovatiyê ya sereke "AŞITÎ".....	15
Pablo PICASSO.....	16
Jı Zargotîna me - 100 gotinên pêşîyan.....	18
Jı Zargotîna me - Em guh bîdîn gotinên	
Bûkeke Kurd jî hêla Bazidê.....	19
Tiyatro -"MEMÊ Ü EYŞÊ".....	20
Jı nav edebiyata cihanê - Pablo NERUDA.....	22
Dergûşa Nefyê.....	24
Quncikê zarokan - Şengilo, Mengilo,	
Qaliçengilo.....	28
Têderxistinok.....	29
Elfabêya Kırılı û Latini.....	30
Kurdistan Spor bû ŞAMPIYON.....	31

Sal : 8

Hejmar : 57

Wêneyê li ser qapaxê, ji kovara DDR-REVYN hatiye wergirtin.

XWEDI : KOMKAR - Swêd

BERPIRSIYAR : Şêroyc BOTAN

NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B

113 58 STOCKHOLM

TELEFON : 08 / 32 82 51

HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska

Arbetar Föreningen

ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN

ADRESS : Döbelnsgatan 16 B

113 58 STOCKHOLM

TELEFON : 08 / 32 82 51

PG : 458980 - 0

Jİ XWENDEVANAN

KURDISTAN

Redaksiyona Kovara Roja Nû ra,
Hevalên hêja,
Ez silavên germ û şoreşgeri ji çiyayênil bilind
yên Kurdistana dila pêşkêsi we hevalên hêja û
hemû xwendevanê Roja Nû dikim.

Hevalno, her weki hun pê dizanîn, dijminê
gelê me bi hemû hêz û qudra ta xwe dixwaze
xelkê me ji dînyayê rakin. Eu dijminê devbî
xwin dixwazin zimanê me, folklora me, çanda
me, çirok û serhati û tarixa me ji holê rakin û
bitemirin. Xebata wan bedilhewa ye û ewana
ji destê gel xilas nabin, serketin ya me ye.

Birayênil delal,
Şert û zirûfîn iroyin da xebata kovara Roja
Nû gelek pêwiste û gelek giring û li ber çave. Ji
bo me hemû kurdên niştimanperwer serfirazi
ye, derçûna Roja Nû. Eu di meydana huner,
çand û edebiyata me da li dijî dijminê kolonya
list û faşist xebata xwe bi çalakî dîke û tekoşina
xwe didomine.

Ez bawerim, ku hemû kurdên niştimanper
wer û şoreşger Roja Nû bixwinin û bidine xwen
dinê, hevkariya xwe ya maddi û manevi li wê
kovara xoşewist bikin.

Hevalên hêja, hejmara Roja Nû ya 11'a gihiş
te destê min. Dema min wefatkirina Prof. Qana
tê Kurdo bihist ez geleki pê nexwesbûm, ketme
nav xemê. Ez serxweşiyê didime Xelkê Kurd û
kovara Roja Nû, Komkar û hemû insanên şoreş
ger û sosyalist û bona malbata mamosta Qanatê
Kurdo.

Belê bawer bikin ku ev insanên mezîn, yek ji
wan ji namire. Ehmedê Xani, Celadet Bedirxan,
Seydayê Cigerxwin, Qanatê Kurdo, Yilmaz Gu
ney, T. Wehbi, Eladdin Seccadi, Erebê Semo...
wê herdem di dilê xelkê me da bijin. Heta ku
çiyayênil me û gelê me (ku wê her hebit) hebin,
ewana ji wê her hebin û tucura nayine jibirkirn.

Hevalên xudan qedir û têkoşer; ez di vê xeb
ata we da pirozbayê didime we û zor sipas li
we dikim ku hun çand, huner û edebiyata gelê
me ji bin pencen dijmin rizgar dikin û ruh didi
nê û pêşda dibin û vê xebatê bi agrê azadiyê ra
dighinîn hev. Bijin û serkevti bin.

Rojêni pêş yên me ne.

Servaneki Riya Azadi li Kurdistana Iranê
Xiziran 1986
Pêşmerge - NEWROZ

HOLLANDA

Hevalên delal,

Kovara ku hûn derdixinin "ROJA NÛ", digi
hije destê me û em dixwinin. Em gelek bi wi kar
û barê we kîfxweş dibin. Di şertên iroyi da, em
zêtr hewceyi kovar û pirtükên kurdi nin. Ji ber
vê yekê em sipasi we dikin, ji bona kovara
"ROJA NÛ". Bi rasti ji kovareke gelek baş e.
Kovar bi kurdîyeke baş û çak derdikeve.

Di xebata we da pêşketin her daxwaza me
ye.

Li gel vê nama han, em ji we ra 5 pirtükân
diyari dişinîn.

Li gel silavên geleri û germ
D. İZOLİ
Den Haag - HOLLANDA

BERLINA ROJAVA

Ez dixwazim li ser çanda gelê me pir binivisi
nim û ji bo we bişinim. Wek hûn ji dizanîn me
tucaran bi zimanê dayika xwe xwendim û nivis
ra kurdi neditiye. Di xwendim û nivisandina kur
di da pur çetinahi dikşinim, ji ber ku hin ez gra
mera zimanê kurdi baş fêr nebûme. Eu nivis
rên ji we ra dişinim, édi hûnê kêmasyîn wan
rastbikin,,, li min biborin. Bi vê rewşê ezé ji we
ra hey binivisinim û bişinim.

Di xebata we da serkevtin û serfiraziye
dixwazim.

Bi silavên şoreşgeri
SIPAN
8.7.1986
Berlina Rojava

Hevalê delal Sipan,

Tıştê giring ew e, ku tu dixwazi li ser çanda
gelê me binivisi. Çetinahiyêni rastnuvisandina zi
manê me -di rewşa iro da- her hene. Qasi ku em
rast dizanîn, li gor xwe, em nûvisen xwendeva
nan rast dikin û nûvisen te ji herweha...

Em gelek şa ne ku iro hevalên wek te dest
pêkirine ji bo berevkirina zargotina gelê me di
xebitin. Di dema iro da ku zordestiya şovenist
kolonyalist li ser ziman û çanda gelê me heye,
û dijmin dixwaze gelê me bê dirok, bê ziman,
bê edebiyat nişan bide; pêwistiya berevkirina
zargotina gelê me li ber çavan e...

Di warê berevkirina zargotina kurdi da Heci
yê Cindi, Ordixanê Celil, Celîlê Celil, Cemîla
Celil, Nûra Ceweri, Xelîlê Çâçan û yên mayîn,
xebatêne gelek hêja kirine, ku di bin ronahiya
wan xebatan da berevkarêni nûgîhiştî dikarin bi
awaki baş zargotina Kurdi berevkin.

Di berevkirina zargotinê (edebiyata anonim)
da prensibek heye ku, pêwiste ew kesen ku di
xwazim çirok, stran, gotinêni pêşîyan û hwd. be
revkin, çawa ji xelkê dibihizin; dengbêj, çirok
bêj çawa dibêjin, ew ji wisan binivisim; têkili
orijinaliya wan nebin.

Di vê hejmara Roja Nû da, xebateke te ji ci
digre. Serfirazi ji bo te!

Bi silavên germin
Redaksiyona ROJA NÛ

hozanê rapervan

Cigerxwin û kovara Hawarê

"Dinya ne hêjaye emê tev bimurin
Jî miriyän ra çi maye jî bil nav"

CIGERXWIN

Dr. Rehber RÊZAN

Destpêk dijware, mîweka beleteye ger jinge dilovan be berhem dikemile, lê barov û gerdelûl bî serda bêne barandin dişewîte, bê dews dîmine.

Destpêka huneri ji her wehaye, ger rî li pêşîya hunermenda, hozana nehatibe girtin û peyv neketibe bendixana û pirtük wek mixedêrata nehatibe qedexe kîrin, çê û xerab afirandin derdikevin, digihnin destên xwendevanan.

Pergala rewşenbirêن pêşverû li Kurdistanê tî cara nebûye cihê dexsinê (hesûdiyê), dî bin mercên civaki û siyasida pişta wan xomiriye, qılıç büye, lê tevi dijiwariyan piraniya birewerêن me sparde nebûn û guh nedan û nadîn kul û êşa, lêdanêن bendixana û penaberiyê li welatên dûr, ew berdewam bûn bo parastina peyama huneri, bo parastina bayexêن mirovayetiyê yêñ rastin, ew berdewam bûn bo dewlemendkirina çanda kurdi û em karin seri xwe bî çalakiyêñ wan bilind bikin ne tenê dî literatûra kurdida lê dî a cihanêda ji -lê pêwiste hin bêtir- bêne nasin û wergerandin, yek ji wan pêşrewan hozanê Kurdistanê yê nemir Cigerxwine.

Çawa bû destpêka hozaniya Cigerxwin? Cigerxwin çi da Hawarê û Hawarê çi lê vegerand?

Dî vê bendêda em hewl dîdin bersivêñ van pîrsan bîdîn, bê guman kareki sexte (dijware), jiber hêviya me ew bû ku bî bilimetra bîpeyvin û ji zûda pîrsen li ba me peyda bûbûn me diwest werama wan ji Cigerxwin xwe bizanin, lê çibkin?... Devi mîrinê çaleke tim vekriye, çi-qas mirov behredar be, hema ber kuni diranê wê ji tiji nake, bê dilovani kenkena ji nav me di-be.

Dî destpêka sedsaliya 20 da çavêن Şêxmûs Hesen vedibin, jiyaneke nû dibine, dî wê demêda impratûriya Osmani hin mîletênet netîrk dabû ber nirê koloniyaliyê û stemiyê, gelên bîndest bî coş dixebeitin bo azadiyê û rizgariyê, yek ji wan gelan Kurd bû.

Piştî hilweşandina impratûriya Osmani sala 1918'a li pêşîya wan gelan asoyêne nû vedibin, rêkxiraw û komelêñ kurdi dikosînин bo serxwebûna Kurdistanê, pir ji ronakbirêñ kurdan tev jiyana siyasi û çekdari dibin, pişkar dibin dî raperinêñ Şêx Seid û Agîrida.

Piştî herdû raperin bî hoviti têne vemirandin ji aliyê karbîdestêñ Turkan, hînek ji çekhil-girtiyan neçar dibin têne Sûriyê, ciwar dibin, ewna qeleman bî tîvingan dîgu hêzin û bî saya rewşenbirê mezîn Celadet Bedîrxan kevira davêjin nav gola çanda kurdi a meng û kovara Hawarê derdixinin, yeke ji başdırın bêrmêñ çiyayı kultûri dî diroka rojnamevaniya kurdida, yek ji wan kevravitiyan hozan Cigerxwin bû.

Cigerxwin bernave, navê wi Şêxmûse, sala 1903'a li gundê Hesarê, nêzikiya Mêrdinê li Kurdistanâ Turkiyê tê dinê. Hesen bavê wi bû û dê bî Eyşanê dihate bî nav kîrin. "Jî 11 xwişk

û birayan tenê sê diminin" (1). Asiya keça mezin bû û li pê wê Xelil û Şêxmûs tê. Rewşa dê û bavê Şêxmûs dijwar bû wek hemû bajarên Kurdistanê pariyê nên amanca serekîn bû, her jî ber wê tengasiyê beri destpêka Cenga Cihani Yekem bardikin tên bajarokê Amûdê, demekê li wir diminin rojgar fersendê lê dibine, dî navbera salekêda bav û diya Şêxmûs jî rûyê erdê radike "Wexta ez 9-10 sali bûm dayik û bavê mîn cûn heqîya xwe" (2). Rewşa Şêxmûs dijwartur dibe bî mirina dê û bavê, neçar dibe li ba birayê xwe Xelil bimine, lê çavtengiya jinbirê mayina wi kurt dîke, ew berê xwe dide deriyê xwişkê Asiya li cem wê dibe rîncber wek piraniya zarokên Kurdistanê. Ew bî şivantiyê û gavantiyê razi nabe "Dî salê 1918-1920 da di rîya hesînda dixebeitê" (3). Meraqa xwendinê dî dilê qencda lêdixe dî 18 saliyêda qonaxeke nû dî jiyana Şêxmûsda vedibe, ew dibe feqêh û jî bo wê kamê 10 salan li Kurdistanê digere li ba mela û şêxên navdar. (4) Sala 1928'a vedigere gundê Tilşîr, li wir icaza melatiyê distine û dibe pêşnimêj.

Melatiya Şêxmûs pîr dîrêj nake ew dabina xwe bî wê pişeyê nahine, şaşiyê û cubê çedîke, dest davêje misasê (garam) dibe cotkar, dî nav wanda dixebeitê bî rûniştvanara 2 gundan dîrust dikin ku bibine simbola wekheviyê, bê stem û zordariyê têda bijin, dûr li çewsandina axa û began, navê wan lêdkin "Çelek" û "Cehenem" li wir gundi li hev nakin, Şêxmûs jî wir bar dîke û tê Amûdê ciwar dibe.

Dî sala 1924 da çavên Şêxmûs Hesen lîser hin pîrsênetewi vedibin "Lîser destê Şewqi Begê Erxani şiyar bûme û bira kurdperweriyê bîriye, bûme welatparêz... û pişti şerê Şêx Seid efendi, sala 1925'a mîn dest bî xebatê kur." (5)

Sala 1925'a saleke taybetiyê dî jiyana Cigerxwin ya siyasida, ew wê salê dinasine wek sala welatparêziya xwe. (6)

Beri raperina mezin ya Şêx Seidê nemir, Şêxmûs Hesen dî warê ramanida her miroveki olperest bû, haya wi jî hawirdor nebû, ew bî vi terzi rewşa xwe jî mera aşkere dîke: "Jî nanê zi-kê xwe û xwendina mîzgevtê pêva li tişteki di nedigeryam, me nîzanibû çawa kurd dixebeitin û jî bo çi dixebeitin" (7).

Hozan dest davêje qelem, bî kurdi û erebi helbestan dînivisine "Sala 1924'a mîn dest bî helbest nîvisandinê kur." (8) Mixabin du hozanêna sala 1925'a çapkiri tenê bî dest meda hene, Cigerxwin hin me xwendevanan agehdar dîke ku diwaneka wi destnîvis heye, ew nedaye çapê jîber van hoyan: "Gelek gotinêni biyani têda hebûn û heta awira mîn jî hatiye guhartîn, mîn ne-xwest wê diwanê çap bikim, lê destnîvis li nik mîn peyda dibe." (9) Jî wê diwanê helbestvan tenê du helbestan vedibjêre û dî diwana sêhemda diweşine: "Cihê xwendina mîn", rûpelê 310 - 312 û "Sebebê çêkîrina rîstê mîn", rûpelê 313 - 314.

Dî helbesta "Cihê xwendina mîn" hozan belgeyêne xîronûlogi aşkere dîke, bayexa wê taybetiye, jîber wan salêna xwendina Şêxmûsê feqêh nişan dîke û demeke kurt jî jiyana wi râberi xwendevanan dîke.

Pişti serdorêna tesewifi dî destpêka helbestanda, helbestvan geşteyên xwe li pey hev rîz dîke:

*Jî gundê Hesarê ku çûme Sinan
Jî wê ez ku çûm der Elibarê mam.
Jî wir ez ku rabûm û çûm Dêrikê
Li wir mame heta giha salekê.*

(1)— Keyo Cigerxwin. Jinenigariya Cigerxwin, kovara Hêvi, hej. 3, Sîbat 1985, rûp. 17

(2)— Dan û satan bî mamostayê mezin Cigerxwinra. Rojnama "Roja Welat", hej. 12, 15 Çeleya Pêşin, 1978, rûp. 8

(3)— Binir: Keyo Cigerxwin, jêderâ binavkiri.

(4)— Bo nasina cihgerêna Cigerxwin seba xwendinê binir: Helbesta "Cihê xwendina min", Kime Ez, diwana 3, rûp. 310-312

(5)— Keyo Cigerxwin, jêderâ binavkiri.

(6)— Roja Welat, jêderâ binavkiri.

(7)— Keyo Cigerxwin, jêderâ binavkiri.

(8)— Roja Welat, jêderâ binavkiri.

(9)— Cigerxwin, Kime Ez, rûp. 314

*Ji wir çûme şaxê liber guhê Cûd
Ji wir hatime Til-Şeira xwe zûd
Ji wir çûme Pêrejê, hind Sefin
Ji wir çûme Ajikê, me sorgul çinîn.*

*Ji wir çûme Îran û hatim Xelan
Kemer min li Amûdê idi best....*

Herweha ramanê n sofizmê dî helbesta "Sebebê çêkîrîna ristê mîn" diyare, lewra helbestvan û wek lî jor gotibû ew diwan çapnekiriye, lê mixabin ew berhemî neket destê n xwendevan û lêgerokan.

Bî van herdu berheman em qonaxa edebi yekemin dî jiyana Şêxmûs Hesenda kuta dikin, ewna ji beri niha bî 60 sali hatine nîvisin, dî vê qonaxê da helbestvan wek mîtesewif û olperest tê nas kîrin.

Bûyerên mezîn dî diroka gelanda herdem dîminin û ta ebed bî mirovanra dijin, lê kargeriya wan lî pişikdaran, helbestvanan û hu nermandan hin bêtire; dî hereta lawitida Şêxmûsê şayir dîbe hevdemê du raperinan; yek bî hoviti tê vemirandin, a dîn ji vêdikeve û bî encama xwe wek a yekemin bû. Dî navbera herduyanda hîzirên şayir têne guhartîn, ew bî mérani tevi xeba-ta netewi dîbe, xwe dîde ber pirseke mezîn, pirsa hisyarkirina gel bo têkoşînê ta kurd rîzgar bibin û barê mezîn dîde ser qelem û ta roja dawiyê 22.10.1984, wi bî tiştî dîn naguhêze û wek helbestvaneki nemir xwe jî gelê kurdra û jî cihanêra ispat dike.

Bî guhartîna birübaweriya şayir qonaxa duhemîn dî jiyana huneri û siyasi ya wida destpê-dike, em karin wê bî vi şêwayi binavinin:

QONAXA HAWARÊ, SALÊN 1932 - 1945 YAN CİGERXWİN WEK HELBESTVANEKİ RAPERVAN Û DİMOQRATEKİ ŞOREŞGER

Gava Hawar derdikeve 15'ê Gulânê sala 1932'a bî şabûneke mezîn helbestvan derketîna wê piroz dike û lî pesna çalakiya xwedîyê wê dîde, helbest jêra dînivisine û bî coş dîkeve nav nîviskarêñ wê, em dî hejmara 4 da şireka wi dibinin "Gotîna Welat" a hatîye nîvisandîn dî ê hîziranê sala 1932'a, herweha dî hunrawa "Marş kiyani" da tarixa 16.11.1942'a dibinin û paşeti tarixan libin helbestêñ wi nabinin, bê guman ew yeka hînek dijwariyan datine pêş lê-gervanan.

Pîwîste hin bê gotin ku şayirê me berhemîn xwe bî bernavê Cigerxwinê Kurdi çap dîkîrin heya 14'a (31 Çêleyê berê 1932'a) û paşê tê naskirin wek Cigerxwin.

Jî 57 hejmarañ Hawarê Cigerxwin dî 28 da besdar dike, em berhemîn wi dî van hejmarañ jêrda dibinin: Hejmar û rûpelêñ kovarê: 4, r.6 - 5, r.7 - 6, r.4 - 9, r.6 - 10, r.3,5,6 - 11, r.8 - 13, r.3,5 - 14, r.2 - 16, r.3,4 - 18, r.5 - 19, r.4,5 - 20, r.12 - 21, r.8 - 22, r.1,3,8 - 23, r.6 - 24, r.7 - 25, r.4 - 27, r.6 - 28, r.7,8 - 29, r.9 - 30, r.6 - 31, r.6 - 39, r.9 - , dî hejmara 39 da (15'ê Sibatê 1942'a) helbesta "Serxwebûna müriyan" diweşîne û paşê heyş mi-han û hefde rojan jî kovarê dûrdikeve, em nîzanîn hoy çiye, dî wê demêda 10 hejmarañ Hawarê derdikevin bî 120 rûpelan, beri kovar bête girtin Cigerxwin dilezine dî: 51, r. 4 - 52, r. 4,8, 11 - 54, r. 2 - 57, r. 4,6 dînivisine.

Piştî van serdorêñ neawazdar û hêvi dikin me serê xwendevanî neyşandibe bî jîmartînêñ jorin, em vegeerin ser hin tiştîne gelempar daku karîbin ta radeyekê lîser naveroka berhemîn Cigerxwin bîpeyêvin.

Bêtiri 15 helbestvanêñ Kurdistanê afîrandînêñ xwe dî Hawarêda çap kîrbûn, bî hejmara helbestan yêñ Cigerxwin jî hemûyan bêtire jî bili berhemîn kilasikan (Ciziri û Ehmedê Xani) yêñ cihê xwe ditine dî nav rûpelêñ kovarêda.

Encama besdariya Cigerxwin 37 berhem bûn dî Hawarêda, 31 jî wana helbest bûn, çiro-kek folklori, bendek, ditonek lîser sengandînê şîr, şirovekirina çend gotina, nameşinek û se-rencik.

Cigerxwin destvala nehatibû nav helbestvaniya kurdi, wi Melayê Ciziri û berhemîn Ehmedê Xani baş zanibûn, jî gencina folklorâ netewi ilham wedigirt, kaniyeke zîmani dewlemend bû, haya xwe jî berhemîn helbestvanêñ Kurdistanê yêñ hevdem jî hebû, bî zîmanêñ erebi, fa-

rîsi û tîrki ji dîxwend.

Diyare zanin û nasina kelepûra netewi û cihani nebese, eger mîrov ne xwediyyê dozekê be, ne xwediyyê birübaweriyekê be. Cigerxwin rîyeke dijwar vebjart, rîya xebatê ta Kurd rîzgar bîbîn û bêperwa kîferat kîr, liser wê rîyê tengasi, hejarti, êş û azar, zindan û lêdan ditin û ta roja dawiyê li penaberiyê amanca xwe parast.

Bilimet dî destpêkêda zani çî dixwest, xwe berpirsiyar dit beramber sitemkariya liser gelê kurd dîbe, bî hunerê xwe tevi têkoşinê dîbe, tiliya xwe ber azadiya welat dîke, ew mijad dîbe serekîn dî wê demêda û ta roja dawiyê. Em vegerin ser helbestên hatîne weşandin dî Hawarêda.

Mijada Welat ne nûye dî literatûra kurdida, pêximberê hesat netewi, hozanê mezîn Ehmedê Xani (1650 - 1707) yekemin pêşrew bû dî wê babetêda (10) û dî pê wira û heyâ rojêni iro cûre-cûre berhem têni nivisandin, ew mijada dî edeb û rojnamevaniya kurdida serekine.

Helbestvanê Kurdistanê gîringiyekê mezîn dane û dîdîn gotîna welat, welat bî ditîna Cigerxwin bûka cihanêye.

*Welatê min tuyi bûka cihanê,
Hemi bax û biheşt û mîerg û kani.*

*Kepo elmase, karê Mûş û Wanê.
Du lêvén te kitêba Haci Qadir
Zimanê te ji benda şêxê Xani*

*Rûyê te agrî Zerdeşt û Mezdek
Dî singa teda kitêba Zenda-vêsta. (11)*

Jî her gelkira simbûlêni pirozi hene, yek jî wana ale, Cigerxwin wê bî van rêzan dînasine:

*Ala rengin pirozbi xweş,
Te hildigirim diçim bî meş.*

*Tu liser milêni xortêni ciwan,
Dî nav teda yek rijek geş
Ala sê rengi tu,
Bî nav û dengi tu,
Nişana cengi tu,
Ey xortêni kurdan. (12)*

Al namîmille, pergâl dijware, dek û fêl bî ser meda têne gerandin, xêr û bêra me talan dîbe, me dikujin:

*Welatê kurda tev xêr û bêre,
Hemi madene tev zér û zive,
Lê çibkim iro maye ji xelkêra.*

*Em ne erebin, ne tîrk û romîn,
Xwedan paşane leşker û komîn.*

*Lê hun dizanîn dînya bî dore
Fitlek li jêre, fitlek li jore.
Xelikê em kuştin evêtin çeman. (13)*

(10)— Binir: Dr. Izedin Mustefa Resûl. Ehmedi Xani "şayirên we mufekîren" fîylesofen we mitesewêfen, Bexdad 1979

(11)— Hawar, hej. 26, 1935, rûp. 4

(12)— Hawar, hej. 29, 1941, rûp. 9

(13)— Hawar, hej. 13, 1932, rûp. 5

Şayir hêdi-hêdi mijada welat fereh dike, qonaxa jiyana wê raber dike, bînkekê jê radwes-tine ku dî çî dilitêdaye û li hawirdor êriş têne ser, ewa gaziyê li kur û keçan dike:

*Silavan zû ji min bîghine kurda,
Bibêje: Ez keçik bûm ta ku bûm pir,
Nedi min xwe weki vê salê esir,
Serê min bû sipi pûş û pelaxe,
Li jêri min çinine xêri axe. (14)*

Talankiriye, rûtbûye, gazi li cangir û lehengan dike ku rewşê bigu hêzin, nalin û daxêن wê kêm bikin "Agir bî Kurdistanê ket, lewra diket haware dil". Gava pergal wehabê agir bî dili her dil-sozeki dikeve û ji bo parastina gotina welat lista navên şehidan dirêj dike, hemû rewşenbirêن Kurdistanê qehremaniya gernasan pêşandan û pêşandidin bî şîr, bî pexşan û bî texlit hu nerêن ciwankariyê, Cigerxwin ji dî wê babetêda bê pişk nemaye; helbesta "Şehnama şehidan" di hejmarên 18, 19 da berdewam dike, ewa pêşkeşi şehidên Kurdistanê kiriye, nemaze yên giyanâ xwe dane dî raperinamezin da sala 1925'a, ew yek bî yek navên kele qehremanan tine: Şêx Seid, Fuad beg, Kemal Fewzi, Yosif Diya, Heqi beg, Xêri beg, Sulêman Ehmed, Etif beg û h.d...

Ew egera (hoya) serneketinê bî felekê heldipesêre:

*Felek bê bexte, lewra xûz û xwere,
Heta iro bî kurdanra neyare,*

*Welatê me weki aşê neyara
Serê kurdan dîhêrt bî bara. (15)*

Dî şerê serxwebûnêda pêwiste hemû hêzên gel besdar bibin, Cigerxwin gazi hemû cihan dike ku bî yekdest, bî yekamanc dakevin qada cengê û skala (loma) dike li dewlemendêن kurdan:

*Rabin li we iro xebat,
Em ji digel we bo welat,
Çêbikin dibistan û ciwat,
Zarok bixwinin roj û şev. (16)*

Ew yekityê dixweze bona rizgariyê "Divê em bibin yek" (17)

Dî vê helbestêda tî programa danine bo wê amancê, lê bî huneri derd û kulêñ me aşkere dike ta xwendevan têbigihîn reya yekityê çawa pêktê, ger axa û bega û milan dev ji reya rast berdane û mijüli talankırına gelin, yan bajarvanêñ kurdan dev ji zimanê mader berdane û bî zimanêñ bêgane dipeyivin. yan:

*"Edip û şayirên kurdan
Bî biskêñ şê mijûl mabûn."*

Dî wê qonaxêda şayirê rapervan xwe bî tenê dîbîne, kes li hawirdor nabine, bî helbestan wê demê aşkere dike ku axa, beg, serok eşir, şêx û mela ne dî hêlê xebatêdane û gel nezane, nexwendiye, bê rîbere, dî bin zordestiya civakidaye, nemaze stem û çewsandina axa û bega, Cigerxwin dijihne wê dabînê dî jiyana riyalida (Waqii) ku derebegêñ kurdan ji dî rîzi dijimîndane, ewna bî hevra xwina gel dimijin û helbestvanê şoreşger xwe dide ber şerekî mezin: "Jî xwera dijiminîne xurt peyda dikirin, carîna cih lê teng dîbû, lê seyda bêperwa şûrê xwe dî ser serê wanra vedîweşand û aşkere digote wan, ez dikim bî vi şûri serê we jêkim" (18)

(14)— Hawar, hej. 4, 1932, rûp. 6

(15)— Hawar, hej. 19, 1933, rûp. 4

(16)— Hawar, hej. 29, 1941, rûp. 6

(17)— Binir: Hawar, hej. 30, 1941, rûp. 6

(18)— Celadet Bedirxan, Cigerxwin, Pêşgotina Diwana Yekan, çapxana Bahoz, çapa 1, rûp. 8, 1971.

(Dumahik dî hejmara dahatû da)

MUSELİYANA:

"BİBLOGRAFYA 8500 PIRTÜKÊN
Lİ SER DİROKÊ, LI SER LİTERATUR,
FOLKLOR, COGRAFYA Ú TEVGERA
AZADIYA GELÊ KURD, JI BO NEŞIRKIRİNÊ
AMADE YE"



*ROJA NÛ : Kengê û çîma we xwc li
Kurdzaniyê (Kurdologi) girt?*

J. MUSELİYANA : Dî sala 1957'an da
mîn li Universita Jidanova filologiya Îrani xe-
laskur. Pişti saleki di serweriya Y. ORBELÎ û
Q. KURDO da beşa Kurdi hate vekirin. Wê
demê Rudenko di beşa kurdi da dixebeitî. Bî
riya wi mîn koma kurdzanan naskir. Ruden-
ko pêşniyaz kir weki ez bîbim kurdzan û
mîn ji pêşniyara wi qebûl kir. Ez ketme nava
koma kurdzanan û em bî hevra xebitin. Ru-
denko geleki alikariya mîn kir, kurdi fêri
mîn kir. Hevalên ku em bî hevra dixebeitin ev
kesana bûn: Suberman, Yivgeni Vasilieva, İ.
Simirnova, Kerim Eyûbi, Zera Üsif (wê çaxê
aspirant bû), Ordixanê Celil (aspirant bû).

*ROJA NÛ : Di warê kurdolojiyê da
we edebiyat û zargotina (folklor) hilbi-
jart?*

J. MUSELİYAN : Erê, min ev tiştana hil-
bijartîn, ji ber ku mîn filologi xwendibû û ez
ji bona vi tiştî hatîbûme amadekirin.

*ROJA NÛ : Xebata we ya herec pêşin çi
bû?*

J. MUSELİYAN : Lî ser pêşniyaza Qana-
tê Kurdo mîn dest bî amadekirina bibliyog-
rafekî kir. Dî vê bibliyografîyâda, lî ser di-
rokê, lî ser literatur, zargotin, cografya û tevgêra
azadiya gelê Kurd, lî ser 2700'i navê
pirtûkan hatiye berevkirin. Ev pirtûkana bî
zimanê rûsi, fransi, elmani, ermeni, gurci,
azerbeycani, italyani ne.

Beri vê cara yekemin, dî sala 1933'an da
bibliyografîyek, dî kovara "Rohilata Şoreş-
ger" da hatîbû neşirkirin. Dî wê bibliyograf-
yayê da (ku yekemin bibliyografya bû) lî ser
700'i navê pirtûkan hebû.

*ROJA NÛ : Du pirtükén we hatîne çapkır-
rin: "Zembîlfiroş" (1983) û "Stranên Kur-
di yêñ Gelêri" (1985). Weki din çi xebatê-
n we hene û nuha hûn li ser çi dixebeitin ?*

J. MUSELİYAN : Du xebatên tevayı yêñ
Qanatê Kurdo û mîn ku me bî hevra amade-
kiriye, nuha ji bo çapkırinê amade ne û dî
demeke nêzik da wê bîn neşirkirin.

Yek ji van li ser destnivisarên Mehmûd
BEYAZİDİ ye, ku wergêra (tercume) "Tari-
xa Kurdistanê" ya Şerefjan BITLISI ye.

BİBLOGRAFYA

(Jî sedsala 16'a heta 1985'an)

Bibliyografyeke nû mîn amade kiriye, ji
8500'i zêdetir navê pirtûkan (ji sedsala 16'
a heta sala 1985'a) têda hene. Pirtükên lî ser
dirok, literatur, zargotin, cografya û tevgêra
azadiya gelê Kurd in. Ew ji amade ye ji bo
çapkırinê.

Xebata ku nuha li ber dest e, "Ferhenga
Elêd (Eşiretên) Kurdi" ye. Qanatê
Vasilieva û mîn, me bî hevra dest bî vê xeba-
tê kir. Pişti mirîna mamosta Kurdo, mîn û
Vasilieva karê xwe berdewam kir û niha em
lî ser wê dixebeitin.

BİREWEREK Ü SALA 2000 AN

*Sal 1965 bû
Ji rojan rojek bû*

*Berf û baran bû
Zivistan bû
Yan germ û havin bû
Weke pir bûyerêñ din
Edi nayê bira min*

*Em du ciwan bûn ji ciwanan
Em du xwendekar bûn ji xwendekaran
Em du kurd bûn ji kurdan...*

*Em evindar bûn
Evindarê welat bûn
Em dilgerm bûn
Dilgermêñ diwaroj bûn*

*Me sond dixarin
Bi wi kar û bari
Me biryar distandin
Bi dil û baweri...*

*" Wê çêbe Kurdistan
Pişti deh salan "*

*" Ta 75 an
Wê çêbûbe Kurdistan "*

*Em du ciwan bûn ji ciwanan
Em du hevrê bûn ji karwanan
Rojekê ji rojan
Sala 65 an...*

*Roj derbasdîbin
Mehe dibin sal
Minal mezindîbin
Ciwan dibin kal*

*Têne hisê min
Tênen ber çavêñ min
Rabûn û ketin
Doza gelê min:
" Ya jin ya mirin "*

*Temaşedikim li sala 75 an
Li sala 46 an
Li sala 25 an
Tinim bîra xwe sala 65 an
Sonda wan du ciwanan
Bo çêbûna Kurdistan...*

*Bila têkeve diroka cihan:
" Her salê 365 rojan
Li sedsalê bistan
Hebûn li Kurdistan
Komêñ sondxaran
evindaran
bawermendan
Bareş û tari pir bûn
Şax serbilind bûn
Zinar bi heval bûn
Zend û mil polat bûn
Daristan û dar
Çem û cobar
Weke Newroz û bîhar
Bi xudan bûn
Bi xudan bûn"*

*Ez dipirsim ji ciwanen sala 65 an
Ji karwanen ketin û rabûnan
Ji bireweren milyonan
Ji hûr û giran
Gelo wê çawa be Kurdistan sala 2000 an?
sala 2000 an?!*

WÊ DI DILÊ ZEHMETKÊSÊN
KURD Û TIRK DA HER BIJÎ


YILMAZ GUNEY

Hîzkîriyê dîlê gel, şîrikê êş û jana gel û tekosherê nemir Yilmaz Guney dî 13'ê Ilonê da ji nav me barkir.

Guney, serfîraziya xwe ji pêwendiyêن xebatkar û zehmetkêşan, ji derd û daxwaziyêن wan distand. Lî Tirkîyê bî Y. Guney û sinetkariya wi, dî perdêñ sinemayê da jiyana gel hate aşke-rekîr û ji bo sinemayê dewreke nû vebû. Ku, ev sinetkarê mezîn di demek kurt da dî dilê gelê Kurd û Tirk da text dani.

Her wusa jiyana Guney bî xwe ji li sinet û hunermendiya wi dihat. Ew jiyana gel bî taybeti ji jiyana gelê Kurd ji nêz va naskiribû û ew bî xwe ji ji jiyanek weha dihat. Dî xortaniya xwe da ewil dest davêje edebiyatê û dûra derbasi sinemayê dibe. Jî ber ku temaşevanêñ sinemayê gel bî xwe bû, Guney, filmvaniyê û sinemayê bî taybeti hilbijart da ku jiyana gel, hêviyêñ wan, tore û adetêñ gel û zulm û zordariya li ser gel pêşçavê dinê bike.

Dî filma Hêvi (Umut) da, ferqiyêñ dî navbera dewlemend û karker û xebatkaran da, nezaniya gel û hêviyêñ mistik û feqiriyê; dî filma Koçero da, jiyana mehkûmeki Kurd, şerê navbera eşirêñ Kurd û şert û zurûfêñ ku dibin sedemêñ mehkûmiyê; dî filma Keri (Suru) da jiyana eşirêñ Kurd yên koçer, urf û adetêñ dî navbera mirovêñ malbateki da, li hember parastina toreyêñ kevnare serhildana ramanêñ pêşverû, jiyana jînêñ Kurd, kedixwariya bazırganiya monopolêñ Türk û ferqiya navbera jiyana bajar û gundan tê aşkerekir. Van filman û gelek filmêñ dîn xelatêñ sereke standin. Sinetkariya Y. Guney dî filma Rê (Yol) dî giha merheleyek wusa bilind ku xelata filmvaniyê ya cihani stand. Dî filma Rê da Guney bî stilek nû û filmvaniyek nû tê pêşçav. Dî vi filmê da cara yekem dî perdeyêñ sinemayê da û dî bin zordestiyeke mezîn da, navê Kurdistanê bî mîrxasi tê nişandan. Evya mîrxasiyek wusan mezîn bû, ku dî Tirkîyê da gelek sinetkar, niviskar, ronakbir û stranbêj hebûn û niha ji hene, lê ew ji tîrsa li Kurdiya xwe ji xwedi dergediketin. Ya gîring ew bû, ku wextê mirov siyasetê hukumetêñ Türk raçav bike, wê gavê mirov têdighiye ku Guney çi mîrxasi nişan daye. Naveroka vi filmê ji ali xwendevanêñ me û bî milyonan gelên dinê tê zanin. Jî ber vê yekê, hewce nine ku em cardin li vir viya bîdin xuyakirin.



Yilmaz Guney ji ber van xebatêñ xwe yêñ giranbuha, bî tevayı 12 salan dî zindanêñ Tirkîyê'da hate rizandin. Lî, wi tucar bir û baweriya xwe winda nekir û dî zindanêñ Tîrkan da gelek roman, çirok, senaryo û xebatêñ siyasi pêkani. Dî sala 1981'an da, bî awaki ji Tirkîyê û zindanêñ wi reviya hat Ewrûpa. Lî wi mîrxasê jîhati nexweşîyeke bê derman ji zindanêñ Tîrkan girtibû, ku ev nexweşî dî dawiyê da bî serket. Guney tevi vê nexweşîna xwe ya giran, berpîrsiyariya xwe û vatîniyêñ xwe ji bo gel jibir-nekir, li diji hukma faşı, zindanêñ wi, êşkence û tedaya li ser gel propaganda û aşkerekir. Dî Ewrûpayê da rûreşîya hukmê faşı û kiryarêñ wan bî filma Diwar (Duvar) cardin ani holê. Ku wê demê gelek welatêñ Ewrûpayê digotin "Tîrkiye derbasi demoqrasiyê dibe". Dî filma Diwar'da rewşa zindanêñ Tirkîyê û çerxa êşkence bî awaki gelek vekiri hate nişandan. Gelek rexnevan û ronakbirêñ Ewrûpayê li hember vi rastiya hanê li filmê rexne girtin û digotin: "Film çarçeva exlaq dirandiye û em ne bawer in ku hovitiyek weha dî Tirkîyê'da hebe". Bersiva Guney li hember van rexnan gelek vekiri bû. Weha digot: "Min dizanibû ku wê rîxnevan, mirovên Ewrûpayi li diji vi rastiyê deren. Min baş dizanibû ku Ewrûpayi hini filmêñ weha nebûne. Lî, daxwaziya min ew bû, jiyana ku min bî salan li ber çavê xwe ditiye û şahid bûme, dî perdêñ sinemayê da bî awaki objektif bîdim aşkerekir. Min dikaribû hinek filmêñ ku li xweşa Ewrûpayiyan dice, çêkim. Lî, tiştek weha ji bir û baweriya min ra û ji rastiya jiyanê ra ters bû. Ewrûpayi qebûl bikin ji, nekin ji, rasti ev e." Bî kurti, Guney hunermendeki wusa bû, ku tevi ewqas astengi û tedâ ji, xwe ne tenê bî gelên Tirkîyê, her wusa bi cihanê da qebûlkirin. Roman û çirokêñ wi bî heşt zimanê navnetewi hâte wergerandin.

Lawê Kurd Yilmaz Guney bî têkoşin, sinet û hunermendiya xwe xizineke giranbuha li dû xwe hişt û wê tim û tim hîzkîriyê dîlê gelê Kurd, Türk û temaşevanêñ sinemayê yên cihanê da be. □



MELAYÊ CİZİRİ

(1570 - 1640)⁽¹⁾

Hozanê edebiyata kurdi ya klasiki Mele Ehmedê Ciziri, yek jî şairên me yên heri mezîn e. Helbestêni wi iro jî jî aliyê ronakbirêni kurd, kesen dindar (mele û feqîyan) va baş tene zanîn. Melayê Ciziri, jî Cizira Botan e. Wi h Cizirê di Medresa Hamra (Medresa Sor) ders dîda. Gora (mezel) wi li nêziki vê medresê (ku li dora Cizirê dikeve), di qubeki da ye.

Melayê Ciziri, li dû xwe diwanek (2) hîştiye. Diwana Melayê Ciziri, çawa di edebiyata kurdi ya klasiki da wîsa jî di helbesta rohilatê da nimûneyeke berbiçav e. Melayê Ciziri yeke-min şairê kurd e, ku hemû şeweyen helbesta rohilatê ya klasiki û weznê arûz di helbesta kurdi da bî kar anîye.

Melayê Ciziri bî xwe sofi bû, lema di helbestêni wi da babeta sereke xwedê û dîn e. Lî jîn, evin, pîrsen civaki û welatperweri jî, uî helbestêni Ciziri da temayêne gîring in.

Tê gotin weki Mela Ehmedê Ciziri, helbesten xwe yên evinê li ser xwişk yan jî keça mirê Botan (ku navê wê Selma ye) gotiye. Di helbestêni wi da, sinorê di naybera evina (eşqa) Xwedê û evina jînê da, gelek caran jî xwendevanan ra ne diyar e. Jî bo ku xwendevanêni Melê, bikaribin wi baş fahmbikin, pêwiste li ser felsefe û edebiyata tasawîfi zanina wan hebe. Wek nimûne di edebiyata tasawîfi da jîn û şerab, bî mecazi evina (ilahi) sembolize dikin, di helbestan da ew jî bo tasvirkirin û şirovekirina Xwedê bî kar tênen anin. Helbestêni Melayê Ciziri yên ku li ser evinê û yên di derbari pîrsen civaki da hatine gotin, bî kurmanciyeke

zelaltır hatine hûnandin û baştır têñ fahmkirin.

Melayê Ciziri, di gelek helbestêni xwe da pîrsen civaki (sosyal) bî hostati tine ziman. Lî ciheki, li dîji zordestiya mir û derebegân û bindestiya xelkê weha dîbêje:

*Lazime li sultan û miran
Pirskîrin li halê êsiran,
Em kirin armancê tiran
Suxteyin dermande ye,
Hêj nizanîm mir di bir in,
Zanit em sih sal êsir in
Cehvnêri pursek emir in.
(Diwana M.Ciziri -Hejar- rûp. 602)*

Lî ba Melayê Ciziri welatperweriyeke romantik heye. Vê yekê mîrov di gelek rîzêni helbestêni wi da dîbine. Ciziri, xwe wek "Şebçiraxê şebi Kurdistan" pêşan dide û pesnê helbestêni xwe dide:

*"Ger ji lu'luyê mensuri ji nezmê tu dixwazi
Wer şî'irê Melê bin, te bî Şirazi çi hacet."*

(Yani eger tu helbestêni nezmê moriyen belvûyi (ince) dixwazi were helbestêni Melê bîbine, çi ihtiyaca te bî Şirazi heye.)

Lî gor baweriya Melayê Ciziri, helbestêni wi, jî helbestêni şâ'irê farsi yê mezîn Şirazi danaxun. Mîrov dikare bêje weki ev pesnê han ne tenê jî bo helbestêni wi bî xwe ne, di vir da Ciziri dixwaze bî zanisti rûmetâ ziman û edeba kurdi bilind bigre. Jî ber ku di sedsalen navin

da , helbesta farisi û erebi geleki pêşda bû û bandoreke mezin li ser şâ'rîn gelên dîn dîkîr.

Disan li ba Ciziri, xweştürin welat herêma Botan e: Mire Botan weha hejayi pesnan e:

*Ey şehînşahê müezzem heq nigehdarê te bi
Sûreyê "Înna Fetehna" dor û madarê te bi
Ney tinê Tebriz û Kurdistan li ber hukmê
te bin
Sed weki Şahê Xurasani dî ferwarê te bin.*

Ciziri, dagırgeriya (istila) Cengiz-Xan û Tê-mûr-Leng rexne dîke û lî diji êrişen Moxolan weha dibêje:

*Sef sef turk û moxol dukeş û hindî li kemin
Bî eceb hatine cengê hebeş û rom û fireng,
Mir û kurmanç li holan qederek westane,
Lê dî nivê bî sef û tipê erek hatine ceng.*

(1) Dî derbari salen bûyin û mirîna Melayê Ciziri da gelek fikir û texminen ji hev cuda hene. Hin edebiyatnas û legeren Diroka Edebiyata Kurdi, salen bûyin û mirîna Melayê Ciziri weha nişan dîdîn:

Sedsala XVI-XVII

* D.N Mackenzie : 1570-1640

(Bnr.D.N. Mackenzie,Melâ-e Ciziri and Faqi Tayran, Şêxê Sen'an,Feqê Teyran,Weşanê Roja Nû ,Stockholm 1986 rûp. 26)

Sedsala XV'a

* Edebiyatnasê kurd Eladdin Secadi:

1407-1481

(Bnr. Eladdin Secadi, Mêjuy Edebi Kurdi Bexda 1952)

Sedsala XII'a

* Wezirê Nadiri: 1101- 1169

(Bnr. Qanatê Kurdo, Tarixa Ed. Kurdi, cild 1, Stockholm 1983, rûp. 92)

(2) Destnîvisarê Diwana Melayê Ciziri heta ni-ha gelek caran hatine çapkîrin. Cara pêşin di sala 1904'an da lî Berlinê ji aliyê Fon Hartman va hatiye çapkîrin. 1924 İstenbol, 1958 Qamışlo, 1964 lî Hewlêrê bî destê Givi Mukriyani, 1977 lî Bexdayê bî deste Sadîq Behaddîn, 1982 lî Teheranê bî destê Hejar (Bî şerha wê va) hatiye neşîrkîrin. Herweha lî Kurdistanîna Tîriyê ji gelek caran bî dîzi hatiye çapkîrin.

DIL JI MIN BIR

*Şox û şengê zuhre rengê
Dil ji min bir, dil ji min
Awurê heybet-pelenge,
Dil ji min bir, dil ji min.*

*Wê şepalê miski xale,
Dêm-dûrc gerden şemalê,
Cebheta biskan sema lc,
Dil ji min bir, dil ji min.*

*Zulf û xalan nûn û dalan,
Wan ji min dil bir bî talan,
Goşeyê qewse hilalan,
Dil ji min bir, dil ji min.*

*Dêm nedirê bo cbire
Xemri yü gis û herirê,
Sine kir amancê tirê,
Dil ji min bir, dil ji min.*

*Sur-şirinê nazeninê,
Kuştum û nakit yeqinê,
Wê bî çengala evinê,
Dil ji min bir, dil ji min.*

*Fetl û taban da xuraban,
Ebleq û cuhtê şebaban,
Dame ber pence w kulaban,
Dil ji min bir, dil ji min.*

*Xwoş xeramê, cz xulamê,
Nazîke şirin kelamê,
Tûtiya eywan meqamê,
Dil ji min bir, dil ji min.*

ŞERÊ ESPANYAYÊ HUNDIRI

Dı ser şerê Espanya'yê yê hundiri ra 50 sal derbas bû. Dı sala 1936'an da, hêzên faşist dı bin serokatiya Francisko Franko da, êrişi hêzên pêşverû kırın û şerê hundiri destpêkir.

Dı destpêka sala 1936'an da kommunist, sosyalist û hin parti û rêxistinêñ din bûn yek û "Eniya Gel" sazkırın. Wê salê, dı 16'ê Sebatê da, hilbijartına parlamentojê çêbû û dı vê hilbijartinê da "Eniya Gel" bî piraniya parlamente-ran, dı hilbijartinê da bî ser ket û dı bin serokatiya Manuel Diez da hukumetek çêkir. Jî bo gelên Bask û Katalonya'yê otonomi hat dayin. Bî sedhezar kes xwendin û nîvisandinê hin bûn. Dı diroka Espanayê da, yekemin car, derê Zanningehan (Universitan) jî zarokêñ karker û zehmetkêşan ra vebû. Ev hukumeta nû, ku reforma axê, sazkırına ordiya gel û gelek guherandinêñ din girtibû bernama xwe, û jî bo wan dixebeit. Lê geleki pêşda neçû jî ber ku dı nav "Eniya Gel" bî xwe da gelek asteng û dijwari hebûn, jî ber ku ew jî gelek parti û rêxistinan pêk hatibû û li ser him tiştan li hev nedikirin.

Dı wan salan da li İtalya û Elmanya faşizm li ser hukim bû. Van herdu dewletêñ faşist û Dewletêñ Yekbûyi Yê Amerika nedixwestin ku li Espanayê, hukumeteke demoqratik li ser hu-hukum bimine. Van herdu dewletêñ faşist, jî xwe berêda pêwendiyêñ xwe bî oligarşıya Espanayê va xurt kırıbûn û jî bo sazkırına hukumeteke faşist li Espanayê, bî hevra dixebeitin.

Hêzên faşist dı roja 18'ê Tirmeh'ê da jî ber hin qelsi û këmasiyêñ hukumeta nû, fîrsend ditin û bî alikariya Elmanya û İtalyayê dest bî şerê hundiri kırın. Elmanya û İtalya jî bî balafîr û cepxanêñ gîran û bî 300 hezar leşker va tevi şer bûn.

Gelê Espanya'yê rojêñ 19 û 20'ê Tirmehê sala 1936'an jî bo parastina "Komara Espanya",

derketin kuçan û meydanan. Gelê Espanya'yê, li gelek herêmêñ welat "Hêzên Berxwedana gel pêk anin. Dı destpêka şer da, Partiya Komunist, leşkerêñ welathiz û anti-faşist li Madridê, Barselonayê zora faşistan birin. Gelêñ Espanya-yê bî zar û zêç, jîn û mîr, şereki bê hempa kîli diji faşistan.

Jî ber ku ev şerê diji faşizmê û jî bo aşiti û demokrasiyê bû; Yekitiya Sovyet û şervanêñ welatêñ din, bî dîl û can alikariya hêzên pêşverû û demokrat yêñ Espanayê kırın. Ev şerê bî heq, bir û baweri û piştgiri ya proleteya û hêzên pêşveçûna cîvaki ya navnetewi xurt kîr.

Jî bo parastina Komara Espanya û li diji têkiliya Elmanya û İtalya faşist, dî vi şeri'da, Yekitiya Sovyet bî 648 balafîr 347 tanq û 3 hezar şervan û hwd. va alikariyeke mezin da gelê Espanayê û bî vi awayi nimûnek jî piştgiriya navnetewi pêşkêş kîr.

Ne tenê jî Sovyet, usa ji 54 welatêñ din, qasi 40 hezar kesen dij faşizmê bî daxwaza xwe tevi şer bûn û li hember faşizmê bî mîrxasi şerkirin. Bî hezaran kes canê xwe feda kîrin.

Ev şerê hundır li Espanayê 32 mehan ajot. Lê quwweta hêzên welatparêz û pêşverûyan li hember quwweta faşizmê ne yekbû. Roja 29'ê Adarê sala 1939'an temamiya Espanya kete destê faşistan. Dı nava sê salan da faşistan jî milyonek zêdetir mirov kuştin. Dı meha Sebatê da hukumetêñ Fransa û Ingiliz û dî meha Nisanê 1939'an da ji hukumeta Amerika, rejima faşist dî bin serokatiya Franco da qebûl kîrin.

Hukma faşist nêziki 40 salan li sei hukum ma. Jî bo destpêka şerê cihani ew gihiştin armancêñ xwe. Pênc meh piştî hatına faşizmê li Espanya, roja 1'ê İlonê sala 1939'an leşkerên Hitler êriş anin ser Polonya û bî vi awayi şerê cihani yê duwemin destpêkir.

DAXWAZA MIROVATİYÊ

YA SEREKE

AŞITİ



Dı dema iroyin da parastına aşitîyê dı dinê da bûye pîrsgirêk sereke û bûye mêtîzina pêşverûtiyê, demoqratiyê û welathiziyê. Lewra wextê mirov kîryarêñ imperialistân raçav dîke, xweş xuyaye ku lî seri DYA (Dewletêñ Yekbûyi Yêñ Emrika) û imperialistên din li ser qedera cihanê û gelan qumar dilizîn, şerê nukleri kîş dikin û dîxwazîn dinê cardîn parevekin. Lî hember daxwazîyêñ aşitîyê yêñ Yekitiya Sovyet û aşitixwazêñ dinê xwe kerr dikin û pêşniyara bê çekkirîna dinê guhdari na-kîn. Lî hember van daxwazi û pêşniyaran bersiva wan tehdit û kîşkirîna çek û silahan e. Ev rewş jî bo duweroja gelên dinê û welatêñ sosyalist talükeyek gelek mezîn peyda dîke.

Nîvşa iroyin, barbariya şer û bî taybeti ji, şereki atomi baş naskuriye û têdîgîhiye, ku şereki atomi qelandîna mexlüqatêñ dinê ye. Te-qandîna bomba atomê lî Hiroshima û Nagazaki û dî demek kurt da kuştina 200 hezar mirovi nehatîye jibirkirîn. Şerê cihanê yê duwemin û barbariya Hitler, ku lî dû xwe 54 milyon miri, 32 milyon seqet û birindar, birçi, jar û bajarêñ kambaxkîri nehatîye jibirkirîn.

1'ê İlonê sala 1941, rûpelek reş û bî gemar e dî dirokê da. Wek tê zanîn dî vê rojê da El-manya Nazi, Polonya zeft kir û jî wê rojê vir-da çavşoriya faşizmê gelek tişt eşkere kir. Êdi dek û dolavêñ imperialistân, faşistan û talankiran, bî perda demoqrasiya sexte nikare bimeşe û roj bî roj rûyê wan yêñ derewkar eşke-re dibe. Aşitixwazêñ dinê, tenê bî daxwaza aşitîyê qayil nabîn. Ewana xwe bî hêz dikin, rêxistînan avadîkin; çi reşik, çi sıpi û çi ji ze-rik gelên dinê dibin yek deng, dibin yek dil û lî diji şerê atomi ala aşitîyê bîlînd dikin. Jî bo aşitixwazêñ dinê 1'ê İlonê rojek bî taybeti

ye. Ev roj bûye sembola dijayetiya şer û parastına aşitîyê.

Lî diji xwinxwariya imperialistân û kîşkirîna şerîn nukleri, xebatêñ rêxistîni jî sala 1948'i vîrda destpêkriye û gihaye iro. Cara yekem sala 1948'an da, jî 55 welatan 500 nûner di komcîvîna ronakbirêñ dinê da lî hev ci-viyan Dî nav van ronakbiran da gelek sinetkar, alîm, niviskar û lêgerinvanêñ bî nav û deng hebûn. Wek Frederic û Irene Joliot Curie (dî il-mê Fizik'ê da hînek icadêñ wan hene), wê-nevanê bî nav û deng Picasso, İlya Ehrenburg, Aleksandr Faddeyev, Fernand Leger û hwd... Dî vê komcîvinê da bîryar hate girtin, ku dî Nisan'a 1949 da, lî Paris'ê komcîvîneş aşitîyê ya cihani bê pêkanin. Jî bo haziriya komcîvîna Parisê bî taybeti Frederic Joliot Curie û Picasso, xebateke bê westan pêkanin. Afişa Picasso ya Kevoka Aşitîyê lî gelek welatan belav bû û bû semboleke aşitixwazan. Careki Picasso tevi hevalêñ xwe yêñ nûnerê komcîvîna aşitîyê dicin İngilterê, lê lî ber derê gumrukê têñ ewîqandin û pêkanina komcîvîna aşitîyê lî İngiltere ji ali hukumeta İngiliz va tê qedexekirîn. Lî ber gumrukê berpîrsiyareki gumrukê ji Picasso ra weha dîbêje: "İngiliz heyranê wê-ne-yêñ te ne, wek wênevane ki jî te gelek hîzdi-kin; lê wêne tiştek e, komcîvîna aşitîyê tişkek din e." Lî ser vê gotinê, bersiva Picasso gelek kurt, lê gelek bî mane ye: "Belki jî bo we pir zor be, disa ji wun dîkarîbin fêmbîkin: Lî herdu ji eyni Picasso ne." Picasso bî vi kîryara xwe, sinetkari û şerê aşitîyê gîhandîye hev, wana bî hev va kelândîye.

Pîşti vê bûyerê, çar roj şunda 1'ê İlonê sala 1950 da Komcîvîna Aşitî yê ya Dinê, bî 1750 nûneren jî 91 welatan li Varşova'yê ci-viyya. Dî vê komcîvinê da "lî diji imperializ-

Dumahik rûp. 17

HUNERMEND Û SERVANÊ



PABLO PICASSO

Wek tê zanin PICASSO wênevaneki bî nav û deng yê navnetewi ye. Wi ne tenê bî wênevaniya xwe deng daye. Lî gel wênevaniyê damezravanê rêçikek nû ye, dî wêne da. Ku ev rêçik yan ji ekol, Kûbizm e. Lî aliyê din ji, ew şervaneki jêhati yê aşitiyê ye.


Pablo PICASSO dî sala 1881'an da lî İspanya'yê lî bajarê Malaga'yê hatiye dinê. Malbata wi bî hal û wextê xwe feqir bûne. Bavê wi mosteyê sinet bûye. Picasso hê ji zarûtiya xwe bala xwe dide wêne û wênevaniyê. Ji sala 1895'an pêda bî hinek grûbêñ ku lî reformên nûjen

digeriyan ra pêwendi datine û vi pêwendîya xwe bî meylêñ sembolist dajo. Sala 1904'an da lî Paris'ê bî ci dibe. Dema ku lî Parisê bî ci dibe; rewşa wi ya abori gelek xîrab bûye û xebatêñ wi dî gelek zehmetiyan da derbas bûye. Dî dawiyê da tevi dosteki xwe yê wênevan li xaniyek wêran da atelyeyek vedikin û li yê derê, pişti gelek zehmetiyan sinetkariya xwe bî dinê dide qebûkirin. Dî sala 1907'an da tabloya heri bî nav û deng "Keçikêñ Avignonê" çêdike. Vi tablo ya Picasso bî xwe ra ekolek nû ji tine holê, ku ev ekol cara yekem gelek tê rex-

nekîrin, lê pişti demek gelek wênevan dikevin vi rêçika nû. Ev ekol, wek ku me di seri da got, Kûbizm bû.

Kûbizm, ne wênevaniyeke ku bî bellî qaidan hatiye çarçevekirin. Reng, roni, si û gîrzkîrin bandora xwe tune. Wêne tenê bî neqş tê xuyakîrin. Reng gelek kêm e. Her tişt bî xetêñ geometrik û gîlover têñ peydakîrin. Mebesta wêne peydakırına estetik û xweşîkbûn nine. Tablo tê parçekirin û armanc gihandina ritmeki, sistemekîye.

Dî vê nîvîse da armanca me ne nasandîna sinetê wêne û ekolan e. Vi karê hanê bî



Pablo Picasso, Guernica

Felaketa şerê hundiri li Espanyayê, bûye babet û sedemê efrandîna wi wêneyê bî dehset. Guernica (gernika), bajareki piçûk e li bakûrê Espanyayê. Herçend ev bajarê piçûk, ne xwediyê ehemîyetekê eskeri bû ji, hêzên Franco bî bombebaranan ew wêran kirin û bî erdê va kirin yek.

taybeti karek pisporiyê ye. Lê, ku mirov behsa jiyan û si-netkariya Picasso bîke, dîvê bî kurti be ji, ekola Picasso bê naskırın.

Pablo Picasso piştî "Keçikê Avignonê" bala sinetkaran û temaşevanê tabloyan dikşine ser xwe. 1917'an da ji bo ku lî ser bale ya PARADE bixebite, dice Roma'yê. 1919 an da li London'ê lî ser bale ya Şewqên Sê Koşe dixebite.

1920 dema wi ya neo-klasik e. 1925'an da tabloyen reqsê çêdiye. Û dûra lî gelek bajarê Ewrûpayê û temaşegahan da raxistinan vedike. Bi vi awayi navê Picasso roj bi roj lî dinê belav dibe û dibe wênevaneki navnetewi.

Lî gel hunermendiyê, ali-yeki Picasso yê din ji, şervaniya wi ya aşityiyê bû. Dî dest-pêka bîhêzkirin û geşkirina şerê aşityiyê lî diji imperyalizm û faşizmê, navê Picasso

dî nav pêşengên aşityiyê da ye. Dî navbera 1940-50 da,

Picasso bî afişen aşityiyê û bî pratika xwe xebatek giranbu-ha pêk tine. Û ji bo pêkanina Komcivina Aşityiyê ya Dinê û damezrandına rîexistinê aşitixwazan, xebateke bê westan dajo.

Wek tê zanin, di navbera sala 1940-50 da ewrên reş û tari bî ser dinê va girtibû û Elmanya Nazi mirin dibarand. Dî vê demê da, Picasso ji wek gelek ronakbirê Dinê, di xebata aşityiyê da ciyê xwe digre. Heta mirov dikare bêje, ku Picasso yek ji pêşengên şerê aşityiyê bûye di Ewrûpayê da. Dî 1948'an da dî Komcivina Ronakbirê Dinê da; dî 1949 an da dî Komcivina Aşityiyê ya Dinê lî Parisê da; 1950 da lî Varşovayê, lî Stockholmê û 1952'an da cardin di Komcivina Aşityiyê ya Dinê da Picasso bî çalaki ciyê xwe digre û dî komcivina 1952'an da belavoka Aşityiyê dî bin imza wi û Henri Matisse tê belavkirin. Û cardin dî sala 1950 da Xelata Aşityiyê ya Dinê digre.

Banga Belavoka Aşityiyê weha bû:

"Geli dostênu ku ji bo aşityiyê dixebeitin,"

"Em gelek dilşa ne, ku ji gelek bir û baweriyen cuda mirov li vê derê ciwyane û munaqeşa pirsgirêka aşityiyê dikin."

"Em ji wek wan li ali nermkirina navnetewi ci dig-

. Bêçekkirin ne bi nişanda-na quwetan, gerek bi axaftin û munaqeşê bê çarelêkirin.

"Li gor ditina me, xebatêna parastina aşityiyê, girêdayi hurmeta di navbera sistemên cuda da ye, ku miletan li gor xwe hilbijartine."

"Vê xızına giranbuha, yanî bo parastina aşityiyê, tevgera baş û pêketi, tehdit nine, munaqeşê ye."

"Dostênu giranbuha, em ji civina we ra serfirazi daxwaz dikin û em di wê baweriyê da ne, ku ramana aşityiyê tenê bi hevkariya me wê li hember ramana şer bi serkeve."

(Destpêk rûp. 15)

AŞİTİ...

mê, faşizmê û tevdanêş ser rawestandin", "diji şer rawestandin" bû bîrýarên sereke û roja 1'ê İlonê wek "Roja Aşiti Ya Dinê" hate qebulkirin. Dî eyni rojê da, tevgerek mezin ji, lî Swêd lî bajarê Stockholmê lî dar ket. Lî Stockholmê ji bo banga aşityiyê kampanyayek cihani destpêkir û bî vi kampanyê dî seranseri dinê da 600 milyon imze hate berhevkirin. Disa dî vê salê da, yani sala 1950 da Konseye Aşityiya Dinê belavokek diroki belavkir (ku ev belavok bî navê "Belavoka Aşityiyê Ya Stockholmê" bî nav û deng e) û dî belavokê da vi banga jêrin kîr:

"Em bê qeyd û şert daxwaziya qedexchirina çekén atomi dikin, ku ev çekén atomi dibe sedemên qirkirina mirovan.

"Ji bo ajotm û rêvebirina vê qedexê, daxwaziya me ew e ku kontroleke navnetewi bê pêkanin.

"Lî diji kijan welati dibe bila bibe, kijan welat ewil çekén atomi bikarbîne wê di nezera me da bî curmek mirovaniyê bê elankirin û dîvê wek curmkarê şer bê mehkûmkirin.

"Em bangi hemû xiretkêşen dinê dikin ku vê belavokê imze bikin".

Belavok ewil ji ali 100 mirov û berpirsiyaren dewletan yêñ bî nav û deng va hate imzekirin. Ev tevgera han dî piştra bû referandûmek navnetewi lî dij bomba atomê û li 75 we-latan 150 hezar komitê aşityiyê hatin sazkirin.

Diroka tevgera aşitixwazan, bî vi awayi û bî gelek dijwari giha iro. Erişkariya hêzên imperyalist, siyaseta wan ya şerxwazi, roj ji roj çêtir tê fêmkirin. Aşiti ji bo gelên dinê bûye daxwaziye jindariye. Ji ber vê yekê ji tekoşina aşityiyê roj bî roj ges û fireh dibe. Gelên dinê ji bo parastina jiyana xwe dikevin vi şerê hanê. Ev rewş xewnê imperyalistan direvine, gavêñ paş bî wan dide avêtin. Ji bo pêşîya şerê nukleri bê girtin, pêwistiya tekoşinek çalak eşke-re ye.

Tekoşina aşityiyê bî şerê çinayeti û şerê diji kedxwariyê va bî girêkeke hisk girêdayi ye. Heta lî dinê imperyalist hebin, heta hemû cureyen kedxwariyê hebin, wê talûka şer ji her hebe. Ji ber vê yekê, tekoşina aşityiyê wê lî gel şerê diji kedxwariyê bimeşe.



100 gotinê pêşîyan

JI HÊLA DERSIMÊ

- 1— Ava mistan ramûsanê dostan meriv têr nabe.
 2— Av golê da geni dibe.
 3— Aqlê sivik barê giran.
 4— Aşê dinan bê av digeri.
 5— Avê ra listik nabe.
 6— Bükê ziman tune, xwesiye iman tune.
 7— Bila avis bi, bila dereng bi.
 8— Bila gur gur be bî pêşta kera mîn bixwe.
 9— Berjêr tûki rihe, berjor tûki simbil e.
- 10— Berxê çê lî ber kozê belu ye.
 11— Bona xatirê xweyi meriv kevir navê kuti.
 12— Bî gulekê bihar nayê.
 13— Bî kerê nikani, lê palasê dixini (palîk dikani).
 14— Beru jî darê ketiye dar nenasîye
 15— Berxîk teslimê gur kirine.
 16— Çav lî deriyan, xweli lî seriyan.
 17— Çû gergerê hat jî gergerê disa kerê berê.
 18— Çav xismê xwe nasdiye.
 19— Dara hîşk pelg nade.
 20— Dest destan dişon, dest vedigerin rûyan dişon.
 21— Dinya dor bî dor e rojekê ji tê roja gayê bor e.
 22— Ditin ezim, neditim dizim.
 23— Dizan jî dizan dizi herd û azman lê lerizi.
 24— Dest jî dest ra ye.
 25— Dar bê gêle nabe.
 26— Dijminê çê jî birayê xirab rindtir e.
 27— Dijminê lavan nabin dostê lavan.
 28— Ez dibêjim hurç vaye, tu dibê rêç va ye.
 30— Ecel hat mecalê nade.
 31— Elçi bê zewal e.
 32— Golikê malê jî gayê malê natırsi.
 33— Goştê her têreki nayê xwarin.
 34— Gund bê kûçik nabe.
 35— Goşt rasti yê bê didan tê.
 36— Goşt bê hesti nabe.
 37— Gayê xweş bî alifê çirug tişt pî rayê.
 38— Xwin bî xwinê nayê şûştin.
 39— Xwin nabe av.
 40— Xwarinê ra xal û xarzi, şer ra ap û bîrazi.
 41— Xwina cahilan tim tik tere.
 42— Xwedê ciyê dibini berfê lê dîbarini.
 43— Xebera reş zû belav dibe.
 44— Her berjoreki berjêreki xwe heye.
 45— Herd hîşk azman dûr.
 46— Hespê çê ço lî xwe naxini.
 47— Heft bavê çê ille şirê dê.
 48— Henek dibin degnek.
 49— Her pêyxamber dua lî xwe kiriye.
 50— Her ziman yek insan.
- 51— Heft hevling ser palasekê avê da çûne.
 52— Hezar cari bipive carekê bibire.
 53— Hêfa bizina kol ya bî koç ra namine.
 54— Jî pîran pîr, hindikan hindik.
 55— Jin bixwazi mîrê xwe dîke wezir ji rezil ji.
 56— Kevirê havinê bavêje kulinê.
 57— Kera xwe pêt grêde, ciranê xwe diz der
 58— Koç jî guh derbaz dibe. mexi
 59— Kalê tazi tembûrê dixwazi.
 60— Ker kere carekê dîkeve çamûrê.
 61— Küçikê xirab gur tini.
 62— Ki şoşbane ew poşmane.
 63— Küçük goştê kûçik naxwe.
 64— Kuzê avê riya avê da tere.
 65— Kuriyê kerê lî ber diya xwe dibeze.
 66— Kul bê qîsur nabe.
 67— Kurme darê jî darê ye.
 68— Ker heft avjeni dizani tere ber avê hemûyan bir
 69— Ker ku ket jî xwedi bêtir kes bî qîsur tine. dîke.
 70— Qiymeta zêr zêrker dizani.
 71— Qantır bizê axiriya dînê tê.
 72— Qûr dîmirin çav zêrini dibin.
 73— Lî pê tengasiyan tim fireti ye.
 74— Moriyê bî gul lî herdê namine.
 75— Mirin mirin e xir - xir çiye.
 76— Mar bê iar nabe.
 77— Mervîn hev merxweren hev in.
 78— Merriv dostê diya xwe ra bavo dibêji.
 79— Merriv pişta xwe eskiyêtegan gîrê nade.
 80— Merriv pişta xwe eskiyêtegan gîrê nade.
 81— Mîrişk ku avê dixwe, lî ser xweli kayt xwedê
 82— Masi golan da gir dibin. dîke.
 83— Malê ne jî lawê çê ra bike ne jî yê xiraw ra .
 84— Mange dewar nebi boxe bî dû nakevin.
 85— Ruvi naçe kozê dar bî xwe va gir dide.
 86— Ruviyan rê bîrine, guran nav derketi ye.
 87— Sir jî pivazê lome dîke.
 88— Silav lî pariyê hazira.
 89— Sêva ku lî darê ye herkesek çoy xwe davêyê.
 90— Şîvan dil bike wê jî nêri mast derxini.
 91— Tiştê çû mede dû.
 92— Wexta nêçirê tê guyê tajiyê tê.
 93— Wadê bîzinê temam bû tere nanê şîvin dixwe.
 94— Zavayê malê kerê malê ye.
 95— Zimanê nerm mar jî qulê derdixine.
 96— Zarok gula mala ne.
 97— Ziman bê hesti ye.
 98— Zikê têr halê zikê birçi nîzane.
 99— Zêr zani zor zani devê tîvingê mor zani.
 100— Zarok fêkiyê mala ne.



EM GUH BIDIN GOTINÊN BÜKEKE KURD JI HÊLA BAZİDÊ

Xwendevanêن hêja,

Ev strana ku min nivisiye li Kurdistana Tirkîyê di nav gelta dema ku dihatê gotin, ew kesên rispi û kal nikaribûn hêşirê xwe bigirtana. Ji ber ku ewan di Serhildana Agiri da ew hoviti û zordestiya dijmin bi çavêن xwe ditibûn û ew bûyer di jiyana xwe da derbaskiribûn. Ev stran, bi taybeti li dor berê Agiri pir dihat gotin. Min ji gotinêن wê berevkir.

Ez neminim neminim neminim.

Neminim neminim neminim neminim.

Min rebenê piştî egitê mala bavê xwe

Neminim li dewrana dînyayê rebenim wayê

Dayê rebenê dilê min gulibûra xwedê
 Pira serê heft riya duwazdeh newala
 Jî bextê egitê mala bavê xwe rebenê ra
 Serra dervas dikim cotek karên xezala
 Ezê rûnêm li komdina Qerebilaxê
 Lî mefreza Taxlika ber serê têl û têlgirafa
 Min rebenê li nava heval û hogiran
 Min di hermeteke bûkini jî wêda dihat
 Destada dergûşeki lawine kolozeki li ber pê sirê
 Jî wêda dihat li çokê xewe dixist digriya

Ax lo bîra lo bîra lo bîra lo bîra

Lê lê anê rebenê lo bîra lo bîra dikir dîqêriya

Berbi taşxana Bazida şewti direviya

Minê xwe berdabû pêşiyê min go xwenga minê

Gelo çîbû çi qewimi û ciriya

Got lo lo bîra agirê kulê bikeve mala Nidahi bagê

Saet li şesê şevê jî bal xwe da derxisti

Fermana serê me Kurdan jî Taşxana Bazidê dibijêre

Egita mîrxasa û cindîyan li hewşa lawê Şewêş efendi

Cînyazê egitên mala bavê min rebena xwedê

Dî xwinêda dixemilinin bê min rebenê bi sungiyan

Tu sêyr bîke vê sibengê kolozê egitan
 Lî ser destê min gulibûra xwedê mane vala
 Herçiyê dûmahi sırgündikin Sinop û Zongildaxê
 Bîrao xwenga te rebenbe welatê dûr nav diwala
 Lo miro dilê min bi demane
 Lo maqûlo dilê min bi demane
 Xwaliqê alemê were rehmê girtiyêñ zindanane
 Rêwiyyê li riyanê, nexwesê nava ci û nivinanê
 Leşkerêñ li bin çekane, kesên li qurbetiyane
 Cîmaeta hazır vebike dergeheki xêrane

Ezê lı bınıya Bazida şewiti
 Hewşa lawê Şewêş efendi diketüm
 Min dit xwinê li zenguyê hespane
 Agrê kulê bikevê mala Nidahi begê
 Saet şesê şevê ji bal xwe da derxistiye
 Fermana serê me Kurdane min por kurê
 Jı taşxana Bazidê tu sêyr bike
 Dibijêre egita mîrxasa û cindiyen
 Lı pey egitê mala bavê min rebenê
 Menfiye û fermane lo lo bira

Ez neminim neminim neminim
 Neminiñ neminiñ neminiñ neminiñ
 Lı piştî egitê mala bavê xwe rebenê
 Neminiñ lı dewrana dînyayê ez rebenbim wayê wayê...

Berevkar : SİPAN



Gundeki Bazidê li ber çiyayê Agiri (Giridax)



Dilbera Rostem di dilqê Wetê da.

Foto: GEVORGYAN



**,MËMË
Ü
EYŞÊ,,**

Beyt-serhatiya "Memê ü Eyşê", ku nımûneyeke zargotana cimaeta kurdaye here belavbûyi ü hizkiriye, ji aliyê gelekk niviskar ü şayirêd kurd ü ermeni da hatiye veçêkirin, bona wan büye kaniya efrandariyê. Xelil Mûradovê reh-

meti ji yek ji wan efrandaran bû, ku ev cewhera zargotina cimaetê veçêkir, ku wê dî berrevoka wi ya bî navê "Du poem" da ronahi ditiye. Xelil Mûradov, xudanê piyesêd "Elenewêrek" û êd mayin, ku ji aliyê radyokompozitoran li

ser himê wan yêñ berê hatine hazirkirin û weşandin. Nîviskar lı ser bingehê vê efrandina cimaetêye delal - "Memê ü Eyşê" usa ji piyes nivisiye, ya ku çendeki pêşda, cara pêşin Tiyatroya Elegezê (Nehiya Araqasê) ya kurdaye cimaetê li



Koma Tiyatroya Elegezê

ser dikê nişan da.

Artistêd tiyatroyê, ku mervêd xwe yêd pêşkêd cudasuda dîlqêd (rol), bî hostati qedandin. Listika wan, xazma listika Dilbera Rostem (Dî dîlqê Wetê da), Razmikê Erfût (Dî dîlqê Memê da), Şikoyê Çerkez (Dî dîlqê Eli Axa da), Hinara Takê (Dî dîlqê Eyşê da) layiqi qimetê pêşekzaniya bilind bû. Wê nenhêri wê yekê ku ew cara pêşin e. Xwe şas nekir, dî listika wê da profesyonalizm dihate kivşê. Em hildin didema kuştina Memê. Dî vê didemê da xebordan kêm e, qewimandin (bûyer) para zêde digre, bî seri, mimik û jestan pêşda dibin. Ew yek ji Dilberê ra li hev hat ku rînd nişan bide.

Şikoyê Çerkez, Razmikê Erfût artistêd tiyatroyêye sereke û hizkiri ne. Ew timê ji dîlqê sereke dîqedinin. Listika wana dî vê piyesê da ji li teva xwes hat. Artistêd tiyatroyêye mayin - Xanoyê Tital

(Dî dîlqê Eylaz Gilave da), Yûrikê Eziz (Dî dîlqê Mexsûd da), Besa Hesen (Dî dîlqê Zozanê da), Toksina Mecit (Dî dîlqê Hevsê da) ji zef baş pêşda hatin.

Piştî nişandayina piyesê, pêşekzan û mîvanêd ku ji paytext û merkeza nehiyê habibûn, fikra xwe gotin dî derheqa destanin û kîmasiyêd piyesê da. Memûrê wezerata RSS Ermenistanêye cabdar Haykaz Erenozyan, şayir-dramatûrg Eskerê Boyik û şayir Tosinê Reşid, rejisorê tiyatroyê ê sereke, xebatkarê RSS Ermenistanê yê çandê (kul-turayê) emekdar Sergey Xanbekyan, ku dî nava axaftina xwe da, xebata kollektiva tiyatroyê bilind qimet kîrin, usa ji çend pêşdanin kîrin û kîmasiyêd piyesê dane kivşê. Xebata şikilkêşê (wênekêş) piyesê Lyova Tokatliyan ji baş hate qimetkîrin.

Kollektiva tiyatroya Elege-

zê ya kurda, ku dî nava salêd heyetiya xwe da weke bist piyes hazîr kîriye û nişan daye, repertuara (bernama listikê) xwe bî vê piyesê va ji dewlemendtir kîr. Zûtirekê tiyatroyê bî vê piyesa teze - "Memê û Eyşê" - ku ne tenê wê li ber bînaliyêd nehiyê pêşda belê usa ji wê bibe mîvanê xebatkarêneñ nehiyêd komarê yêd mayin.

PRISKÊ MIHYÎ
(Miqaledarê Riya Teze)

Ev miqale, ji rojnama "Riya Teze" hejmara 9-ê Gulânê 1986-a hatiye wergirtin. Temamiya miqâlê ne evqas e, lê ji ber kîmasiya ci, em tenê kurtasiya wê didin.

RN.

Pablo Nerûda

Pablo Nerûda meha Tebax'ê sala 1904'an da hatiye dinê. Navê wi yê esli Ricardo Nef-tali Reyes Basoalto bû. Pişti bûyina Nerûda diya wi, ku mamosteyê dibistana destpê-kê bû, dî eyni salê da diçe he-qiya xwe. Bavê wi ji bî karê cotari aboriya xwe dimeşand. Bî kurti, rewşa abori ya mal-bata Nerûda ne baş bû. Jî ber-vê yekê ji, jiyana Nerûda dî gelek çetinahiyân da buhuri-ye.

Destpêka Niviskari Ya Nerûda

Nerûda cara yekem dî nav-bera sala 1917-20 da dest bî nivisandina helbestan dike. Nivisêni wi ewîl bî navê Neftali Reyes têñ belavkîrin. Lî dî dawiyê da navê Pablo Nerûda tê xebitandin, ku ev nav, na-vê niviskareki Çekoslovakî bû û hizkiriyezi Nerûda bû. Pişti sala 1920'i Nerûda lî bajarê Santigoyê bî ci dibe û bê westan nivisandina helbestan dom dike. Cara yekem dî sala 1923'an da bî navê Crepuscu-lario (Reşayiya Şevê) pirtû-keki çap dike. Jî bo çapkırına vê pirtûkê saeta destê xwe û çend parce eşyayêni xwe dif-roşe. Dûra bî navê El Honde-ro Entusiasta (Darçuqlivanê Pêgirti), Veinte Poemas de Amor Yuna Cancion Desesperada (20 helbesten evini û straneke bê hêvi) tê çapkîrin.

Dî sala 1925'an da bî teva-yi xwe dide edebiyatê û sê pirtûkan "Destpêkirina miro-vê bê dawi", "Helqe", "Miro-vê ciwarkiri û hêviya wi" çap dike.

Diplomateki Hêja û Jir

Dî sala 1927'an da lî serba-jarê Bûrma'yê li Rangoon'ê dibe konsolos. Pirtûka helbes-tan yê heri bijare û yê bî navê "Xaniyê Rûyê Erdê" lî vê de-rê tê weşandin. Sala 1928 li Colombo'yê, 1930 li Batavia'yê konsolosi dike. Dî van salan da lî Cava'yê bî keçikeki Hollanda'yî ra dizewice û pişti du salêni din vedigere Şili'yê. Sala 1934'an da lî İspanya'yê li bajarê Barcelona'yê, 1935'an da lî Madridê cardin konsolosi dike. Dî vi navberê da gele pirtûkên wi tê weşandin û bî gelek mirovên bî nav û deng ra pêwendiyêni wi çêdibe. Wek Federico Garcia Lorca, ozanê bî nav û deng Ruben Dario (ji Nikaragua), Rafael Alberti û hwd.

Serê İspanya Yê Hundiri u Nerûda

Dî sala 1936'an da lî İspanya'yê şerê hundiri destpêdi ke û Federico Garcia Lorca tê kuştin. Ev kuştin bandoreke mezin lî ser Nerûda peyda dike û Nerûda cara yekem hel-



besta xwe yê giranbuha yê si-yasi dînivisine, ku navê vê helbestê "Bo biranina Şervan-nê Mîri Stran" bû. Dûra lî Paris'ê bî ci dibe û dest bî weşandin kovara "Hozan-nê Di-nê Gelê İspanya'yê Diparêze" dike. Dî sala 1937'an da lî Parisê bî hozanê İspanyoli Cezar Vallejo ra "Grûba İspanya-Emrika Bo Alikariya İspanya'yê" sazdikin. Dûra ji, lî Madrid'ê beşdari Komicivina Niviskara Yê Navnetewi Yê ll'an dike.

Dî sala 1938'an da dizvire Şili'yê. 1940 da cardin dibe Serkonsolosê Meksiko'yê. Li wê derê bî hunermendêñ Meksikayi û Emrikayi yê heri bî nav û deng ra dostani datine, ku dî pirtûka wi ya bî navê "Strana Cihani" da bando-ra çanda Meksika'yê tê xuya-kîrin. Dî 1941 da Nazi'ye Meksikayi êrişê wi dike. Sal 1943 ye, strana wi yê bî navê "Strana Stalingrad'ê" lî ser a-

fişen mezin û lî diwarê Meksiko'yê tê belavkirin. Pablo Nerûda bî vi awayi, lî diji faşizmê bî çalaki şer dike.

1945'an da cardin dizvire Şili'yê û lî bakûrê Şili'yê lî ser navê bajarên Trapaca û Antofagasta'yê wek senator tê hilbijartın. Evan bajaran, merkezên karkiran bûn. Disa dî vê salê da dibe endamê Partiya Şoreşger Ya Şili'yê û lî diji Serokdewlet Gabriel Gonzales, ku Gonzales bî piştgiriya şoreşgeran bûbû serokdewlet û dûra ji lî diji wan ciyê xwe girtibû- şerdike. Nerûda lî diji G.Gonzales nameyeke dûr û dirêj dinivisine û ev name lî nav gel belav dibe. Ser vê yekê, dewleta Şili'yê, Nerûda wek ixanetkarê welat êlan dike. Lê Nerûda lî ber Senatoya Şili'yê xwe diparêze û gotara xwe ya bî navê "Diriciminim" dixwine. Dad-

geh bîryara girtina wi didin. Mala wi jî ali ajanê hukumetê va tê şewitandin. Lê Nerûda teslim nabe û dî sala 1949' an da bî ser çiyayê And'ê ji Şili'yê dûr dikeve. Piştî bîryara girtina wi û heta sê-çar salan bî mehkûmi û dî gelek çetinahiyan da derbas dibe. Sala ku derbasi dervayı welat dibe, dî eyni salê da lî Paris'ê beşdari "Komcivina Aşiti-xwazê Dinê" dibe û dî vê komcivinê da dibe serokê vê rîxistinê. Dî sala 1950 da pirtûka "Strana Cihani" tê çapkirin û dî vê salê da tevi Picasso "Xelata Aşiti Ya Dinê" distine. Dî sala 1952 da bîryara girtina wi tê rakirin û Nerûda cardin dizvire welatê xwe. Jî vê salê heta 1970 gelek xebatên hêja dike û gelek pirtükên wi têne weşandin.

Sal 1970 Nerûda jî bo Salvador Allende dikeve kam-

panya hilbijartınê û dî 1971 da dibe Serêlçiyê Perisê, ku vê demê S. Allende Serokdewlet bû. 21'ê Çiriya Pêşin 1971 da Xelata Nobel'ê ya Edebiyatê distine.

1972'an da jî wezifa xwe yê Elçitîyê vediqete û dizvire welatê xwe. Dî 1973'an da beşdari hilbijartına Parlamenê dibe û pirtûka xwe ya bî navê "Banga Kuştina Nikson û Pez-nê Şoreşa Şili'yê" diweşine. Jî bli vi bangê, bangek dinê ji dike, ku ev bang ji ronakbirê Ewrûpayê û Latin Emrika'yê ra tê kîrin. Bang jî bo temartîna şerê hundiri yê Şili'yê bû. 11-20'ê İlônê sala 1973'an da cunta leşkeri ya faşist bî zorê tê ser hukim u Salvador Allende tê kuştin. Pê ra ji mal û xaniyê Nerûda tê talankirin û şewitandin û dî 23 İlôn 1973 da Nerûda dice heqîya xwe.

Jî Pablo Nerûda Du Helbest

"STRANA PAYEBILIND "

Ez dûr ji bajarim û hesinkarim.
Li qeseban, li gundan têñ xwendin
helbestêñ min

Li meydana ji dibe,
li xaniyêñ operayan ji,
Li kêderê dibe bila bibe,,
Li Patagonya.'yê
ji hiribirêñ mêsinan ra ji.

Min helbest xwend.
Lewra gel im ez,
Yêñ bî pêçiya nayêñ hejmartin...
Dî dengê min da qewetek gur û xurt heye.
Jî bo bejn avêtinê,
Jî bo kêrhatina çirandina bêdengiyê.
Em gel in,
Cardin bicandibin jî mirinan.

GELE SERFIRAZ

Dî nav vi şeri da ye dilê min
Wê bî serkeve gelê min
Hemû gel wê bî serkevin yek bî yek
Van êşan, wek destmalek şilkiri
Jî nava qûman
Jî Rawestgehêñ şehidan,
Wê binizile û her tiştî derxe holê
Lewra rojêñ serfiraziyê nêz e
Wê demek bêdeng be kina dilan
Bo ku destê cezabiran nericife,
Bo ku roj bêñ dagirtün,
Gel li kolanan.
Wer xweşik, wer xurt
Bo ku ciyê xwe bistine!
Ev e roja min, ev
Ev e xweş ditina min
Tune weki din ala min!

DILSOZ

DERGÜŞA NEFYÊ

MÜNZÜR ÇEM

Werger(ji turki) : Xalit LEZGIN

Teqe-req bî deriyê vagona reş ket û hate girtin. Wê gavê kesên dî vagonê da, çavêن xwe bêtir vekîrin, lê tu tiştek nediditîn. Herder şeversê tari bû. Gelo niha wê çi bê serê me. Ewana wê çi bî me bîkin? Rêwiyêن vagonê, lî ser bersiva van pîrsan dîramin, jî xwe dîpîrsin. Hema wê gavê hej bî vagonê ket, jî ciyê xwe liviya. Peyra dengê tûdûka tirênenê dûr û dîrêj hate bihistin. Ev işareteta wê yekê bû ku pişti Dersimê, wan, Eleziz jî lî dû xwe hîştibûn. Ev, destpêka xeribiyê, hesret û veqetandineke nû bû.

Rêwiyêن vagona reş bêçare bûn. Hîn jî wana pişta xwe spartibûne textan. Hînek jî wan jî lî ser piyan rawestiyabûn. Gişt westiyayî bûn, te digot qey v dî ciyê xwe da bûne kevir. Jî ciyê xwe nediliyiyan. Jiyana firariyê bî mehan lî ser ciyayêن Dersimê, paşê bendemayina wana lî istasyona Elezizê ku hefteyeki lî ser bêtona sar derbas kîribûn.

Delal, lî ber pencera vagonê ya qasi desteki mezîn rûniştibû. Desten xwe yên mezîn lî ser çokêن xwe dî hevra derbas kîribû. Xur û şewatek ketibû herdu çavên wê. Jan dîda. Ew çend roj bûn wek çavkaniyeki hîsîrk rîjiyabûn jî çavê wê. Hîşê wê hertüm lî ser rojêن buhuri bû.

Pencere pîr biçûk bû, belki kevotkek bî zorê bikaribûya têra derbaz bîbûya. Hesineki pahn çapraz lî ser pencerê xistibûn û ev quâ piçûk bûbû çar parce. Lê disa ji ew jî tunebûnê çêtir bû. Kêm be jî ronahiyê xwe têra berdiда hundur. Delalê, êdi dorberê xwe didit û qelebalixa wan mîrovêن jixwederbasbûyi jî hev derdixist. Lê eger ku ev pencere jî tunebûya? got dî hundurê xwe da. Wê gavê destê wê lî ser erdê vagonê bî tişteki hîşk û gîlover ket. Meraq kîr, ew jî erdê rakîr bîre ber bêfila xwe û bêhnkir. Buşkul bûn ew. Ango heywan barkırine birime dî vê vagonê da, xwe-xwe ra got. Wê gavê desteki milê wê qefalt. Ev destê Fatê bû. Wê serê xwe spartibû diwar û lingêن xwe berepêş dîrêj kîribû. Destê xwe yê dîn ji dabû erdê, jî xwe ra kîribû desteg. Melê bêtir ba-la xwe da ser Fatê. Rewşa wê nebaş bû. Singê wê mina korika agîr radîbû û rûdînişt. Destê xwe dani ser eniya wê, dilopêن xwidana sar, destê wê şîl kîr.

—Ciyê te heye Fatê?

—Ez nexweş im, got Fatê.

—Rojêن te hatin, dîbe roja razanê (we-lîdandinê) be?

Wê bî zorekê, bî xwe ra dit û bersiv da:



Wêne : SİYABEND

—Lı ser min bêhtengi û giraniyeke mezin heye. Hundur bê hewa ye. Ez dikim bifetisim. Hinek sancû ji heye, nizanım belki welidandin be?...

Melê, disa berê xwe da pencerê û dî ber xwe da bî nermayı got:

—Dua bîke ku ne welidandin be. Ne pine û paçek heye ne ji kincek. Dî nav evqas mirov da tu dê çawa bikaribi?...

Fatê tu tiştek negot. Herdu desten xwe da ber rûyê xwe û hûr-hûr giriya.

Dema tîrêndî wê riya bê dawi dâ bî teqe-req dîkîsiya û dîcû, jan û sancuya Fatê ji her dîcû zêde dîbû. Êdi usa xuya

bû ku wê biwelidiya. Jinên ku lî ber serê wê civiyabûn, ketibûne nav bêheduri û telaşê. Dawiya vê işe han wê çawa bîbûya gelo?

Dî vê navberê da Fatê disa destê xwe dîrêjê Delalê kîr. Tiliyên wê yên hîşk di destê wê yê qelişi û zitoli da rûnişt.

—Xwişka Delal! Ev çiye hate serê min ji bo xatirê Xwedê Dî nava evqas insan da weldandin çawa dibe. Hela jin û zarka deyne aliyeke, lê evqas mîr li tenışta me rûniştine. Lî ber çavêن wan weldandin dibe? Qedera mîne reş û heş!... Ewqas kes mîrin lî Dersimê. Gulleke malxi-

rab nehat lı min neket. Hat lı tenışta min lı bavê zarokan ket mîrata gullê. Qet nebe iro ev afata han nedîhate serê min.

Delalê qet hewce nedit ku hêşirkên çavêن xwe zuha bike. Got:

— Ber xwe nekeve. Ev ne quşûr û këmasiya te ye. Xemxwarin û şermkîrin ne hewce ye. Jî xwe me heta iro ewqas rojên tehl û serpêhatiyêن şermê ditin ku... Tu dê çîma lı ba mîran şermbiki, welîdandîne, ma şerm e?

Fatê jî ber sancûyan bêhelak bû. Bersiva hevala xwe neda. Piştî qasekê ku bî xweva hat:

— Delal, bang lê kir.

— Bêje.

— Tu dizani ez jî te hızdikim. Em heta niha jî hev ra mina du xwişkan bûn. Rewşa min ne başe. Ev derdê han wê min bikuje. Eger ez bîmrîm, herdu zarokêن min wê lı ortê bê xwedi biminin. Kes lı wan xwedi dernakeve, ewê bîmrîm. Eger bavê wan hebûya iro, min xem nedixwar. Ew jî tune. Ev tûrêna han wê me kuda bibe, çi wê bê serê me lı wir, em nîzanın. Ez zarokan emaneti te dîkim. Soz bide min ku tu lı wan xwedi derkevi. Eger hûn birçi man, bîla ew ji bî we ra birçi biminin. Lî wan bî tenê nehêle?.. Got.

Fatê kelegiri bî çavên tiji û bî dengeki lerizi dipeyi. Te digot xencerek lî serê dilê Delalê ketiye, ewqas dilê wê bî Fatê dişawiti. Destê xwe danî ser sermila cîra-na xwe:

— Xwedê neke Fatê. Ev ne cara pêşin e ku tu zarokan tini. Wê derbas be, me-raq neke!

— Le eger tiştek bû, soz bide ku tu da-xwaza min lı erdê naxi.

— Soz. Ez bî navê ewliyayêن Dersimê sond dixwîm.. Ez jî zarokêن xwe ra çawa bîm, jî zarokêن te ra ji usa.

Fatê çavên xwe girt.

— Biji, got.

Ew mîrovêن westiyayı dî vagonê da, hineki bî ser xweva hatibûn, hinek can ketibû rûyê wan. Jî ber qêrin û zarina Fatê jî ber sancûyan. Hinek jî wan dîgeriyan û êdi dipeyivin. Carna hin kes jî wan radibûn hilpaski pencerê dîbûn û tiştêن ku diditîn jî yêñ din ra digotin.

Zarok lı qunceki kombûbûn. Herdu zarokêن Fatê jî dî nav wan da bûn. Jî aliki va şerm dîkirin û jî aliki va jî berxwe dîketin. Dema zarin jî diya wan dihat, tîrsek dîkete dîlê wan. Êdi lî rûyê hevalêن xwe jî nedînhêrin. Hinek jî wan bî tinaz dîkeniyan, hin kes jî tenê berdîketin, dîlê wan bî vê rewşê dişewiti.

Demekê:

— Min jî erdê hilinin, hêz û hedûra min nema.

Jinan usa kîrin, gotin belki ya baş ew e. Mêr jî bêdeng lî dorê civiyan. Piştî xwe zivirandibûn jinan û serê wan di ber wan da usa bêdeng mabûn. Wê ga-vê Delalê dî nav jinan da nêziki Zeynê bû, ku pirejîneke lî ser xwe bû. Welîdan-dîna wê nêzik bû. Ne pine û paçek heye ne ji kincek, emê çi bikin?

— Erê lê, divê em tişteki bikin, Zeynê bersiv da Delalê.

— Başe tu çi difikiri?

— Ka lî ser me çi heye Xaltiya Zeynê?

Jî xwe herkes jî nhava niv tazi maye lî ortê. Tiştêن ku lî ser me hene ew ji peritine.

— Ma weki din çareke me heye?

— Na, got Delalê.

— Ne tenê jî bo lixwekirinê, lê jî bo ku lî ser razê ji disa cil û pine pêwistin. Tu jî jinan ra ez ji jî mîran ra em bêjin, got û berbi mîran çû.

Delalê dizanibû ku jî herkesi pirtir iş lî ser milê wê maye. Dest avite kofiya xwe, xwest şera lî dor kofiyê alandi ve-ke, destê wê bî porêن wê yen qutkiri ket, mina ku sitlek ava sar dî serda rijiya be bedena wê sîk-sar bû. Paşê agirek kete

bedena wê û ricifandineki pê girt. Hışê wê disa çû ser rojên bori.

Dema ku çawa hatîbûne Elezizê, eske-rênen tirkan guliyêن wê ji biniva bîribûn. Ew ditin û esker hê ji lî ber çavêن wê bûn. Kela xwe tiji kîribû û çavêن wê bî hêşirkan tiji bûbûn.

Bî wi awayi Delalê qaseki xem û xeyal dane bêri. Lê pîr neajot, hate ser hışê xwe.

— Niha zarokek wê were dînyayê. Dî-vê em wê bîdîn jiyandin, got û karê xwe domkir.

Dî dawiyê da disa qêrin û zarinek hat bîhistin. Koma jinan xwe dî ser Fatê da xwarkîrin wê gavê dengê zarokeki lî va-

gonê belav bû. Herkes bêhneke fire girt. Mêvaneki nû tevi wan bibû, ken û kîf-xweşi bî xwe ra anibû . Rûyê herkesi di-keniya. Jinan çember lî dora Fatê vene-kîrin. Pil û pirtênu ku berhevkîrbûn lî bî-nê wê raxistin û dî nav jinan da ya here zane û bî tecrûbe navika zarokê bîri.

Zeynê, demeki jî koma jinan veqetiya. Çû lî ber pencerê rawestiya, destênu xwe lî ser newqa xwe dani û dî pencerê ra ni-hêri û got

— Yek lî me zêde bû. Hejmara me pîrtîr bû niha. Piyê zaroka nefiyê wê bî xêr be, wê bî xwe ra oxirê bine.

Gîşk ziviribûn lî wê dînhêrin.

NAMEYEK JI NURETTİN ZAZA

Mamostê Delal,

Roja Nû, hejmar 13 (1986) giha destê û mîn tê de "pirs û bersivêñ" me xwen-dîn. Gelek spas.

Bî destûra te, lî ser vê danûstandinê çend gotinan bêjim:

1- Şaşiyêñ çapê: ŞERÊ AZADÎ lî ser bûyerên şerê Kurdistana Iraqê ji sala 1961 heya sala 1964 e.

2- Divê neyête bira xwendevanan ku ez neyartiya Soraniyê dikim û Kurmanci bî ser wê de digirim. Ev tişt jî mîn dûre.

3- Daxwaza mîn ev e ku berê tevlî-hev kîrina van zaravayan, divê ku Kurmanci kurmanciya xwe, Zaza zaza-kiya xwe û Soran ji soraniya xwe xweş bîzanin û lî gora bingehêwan, wan bi-pêşda bîbin. Heçi yekbûna wan e, dî-vê ku em hêdika bî vi kari rabin da ku xwendevanêñ me yêñ nûgîhaştî şâş û gêj nebîn.

Edî xweşi û serfiraziya we

10.9.1986

N. ZAZA



ŞENGİLO MENGILO QALİÇENGILO

Wextekê bizinek ji keriyê pez tek dibe, diçe çiyê. Binê zinareki dikole. Ciye xwe çêdike. Bîzin hema lî wê derê ji dizê. Sê kara tine. Navê yeki datine Şengilo, navê yeki Mengilo, navê ê dinê Qaliçengilo.

Çaxê karık givrik dîbin, maka wanâ dîbêje:

—Kengê min got:

*Sengilo, Mengilo,
Qaliçengilo,
Ez çûme zozana,
Şir kete guhana,
Werine dana
Deri vekin.*

Hûn paşê werin deri vekin.

Cend roj usa derbaz dîbin.

Rojekê gur dengê bizinê seh dîke. Xwe lê dîtelîne. Sîbetirê dema bîzin di-
sa diçe zozana, gur beri hatîna wê tê lî
ber deri dîsekîne û dîbêje:


*Sengilo, Mengilo
Qaliçengilo
Ez çûme zozana
Şir kete guhana
Werine dana
Deri vekin.*

Şengilo dîbêje:

—Mengilo, Qaliçengilo, deri venekin, diya me nine, wextê dana nine.

Qaliçengilo ji dîbêje:

—Raste, eva diya me nine, dengê wê qalinde, dengê diya me zîrav û şirine.



Lê Mengilo gurra (bî gotina) wana nake, dîbêje:

—Diyameye û deri vedike.

Gur wi çaxê dîkeve hundur, Şen-
gilo, Mengilo û Qaliçengilo dadu qurti-
ne, lêdixê diçe.

Bîzin vedigere, tê dînhêre ne Şen-
gilo, ne Mengilo û ne ji Qaliçengiloye. Ge-

Ieki dîke mikemik, geleki gazi wana dîke, lê kesek caba wê nade... Ew êdi lî wêderê nasekîne, radibe dîce cem teyr, dîbêje:

—Teyro, gelo te hersê karîkê mîn nedîtine?

Teyr dîbêje:

—Mîn nedîtine.

Bîzin radibe dîce cem leglegê, dîbê:

—Gelo te hersê karîkê mîn nedîtine?

Legleg dîbê:

Mîn nedîtine.

Bîzin radibe dîce cem hîrcê, dîbê:

—Gidi, ez bextê teme, gelo te hersê karîkê mîn nedîtine?

Hîrc dîbê:

—Mîn nedîtine.

Bîzin hew dînhêre gur lî rastê direve, dîbê: "Hebe, tunebe, evi guri karê mîn xwarîne..." Dîce pêşîya gur, dîbê:

—Guro reva tera kîvşê, weki te karê mîn xwarîne, were şerê mîn bî tera şere. Dîbê: Te Şengilo, Mengilo, Qaliçengilo xwariye. Tu diranê xwe tûjke, ezê ji sturiyê xwe tûj bikim.

Gur disa dîbê: "Eva baş bû, nuha ezê wê ji bixum", û radibe dîce cem hedad, weki diranê xwe tûj bike. Lê hedad dewsa tûjkirinê, diranê wi ko dîke.

Bîzin ji dîce cem hedad. Hedad sturiyê wê rînd tûj dîke, û bîzin lêdixe tê meyda, weki bî gur ra şer bike.

Gur û bîzin geleki şer dikin. Beri êvarê bîzîna kuvi sturiyê xwe yê tûj li zîkê gur dîxe, dîqelîşine, Şengilo, Mengilo û Qaliçengilo ji zîkê wi derdixe.

Bîzin bî karê xwe şadîbe û karê wê ji teze fam dikin ku deri lî herkesi nayê vekîrin.



Ev çiroka jorin a unonim, ji pirtuka mamos-te Hecîye Cîndî "3. Zimane Kurdi pirtuka dersê" hatîye wergirtim.

TÊDERXISTINOK

Lî avê dixim, naşkê
Lî kevir dixim, dişkê.
(*qəH*)

Tışteki mîn heye,
Hesp dîce, zin naçe.
(*nd ŋ aV*)

Çar çarix
Bist û çar bendçarix
(*Nal u qizmarê hesape*)

Qesreke sıpi
Bê deri.
(*HəH*)

Ser nîkul e
Dîdê xweş agire.
(*Tetka tifinje*)

Radîbe dîgri
Rûdînê dîgri.
(*Zincir*)

ELFABE

БЭЛГВЭШИН

Ji bo xwendevanênu ku dixwazin elfabeyênu ku kurdi pê tê nivisandin fêrbin, em di vê hejmarê da elfaba Latinî-Kurdi û Kirili-Kurdi didin. Di hejmareke din da ji emê ya Erebi-Kurdi bidin. Bi herdu elfabeyan ji me nimûne da ku xwendevan bikaribin herdu elfabeyan rûbari hev bikin.

RN

LATİNİ-KURDİ KİRİLİ-KURDİ

Latinî-Kurdi	Kirili-Kurdi	Latinî-Kurdi	Kirili-Kurdi
Aa	Аа	Аа	Нн
Bb	Бб	Ђђ	Оо
Cc	Щщ	Џџ	Пп
Ҫҫ	Чч	҆҆	҇҇
Dd	Дд	҂҂	Рр
Ee	Әә	҃҃	Сс
Êê	Ее	ӬӶ	Шш
Ff	Фф	ӮӰ	Тт
Gg	Гг	҄҄	҈҈
Hh	һһ	һһ	ӮӮ
Ii	Ьь	Ьь	Үү
İi	Ии	Ии	Вв
Jj	Жж	Жж	Ww
Kk	Кк	Кк	Хх
Ll	Лл	Лл	Йй
Mm	Мм	Мм	Зз

Бе wa готэ бэлгэ дара;
Бэлгед дэлал, гэли бэлга,
Паиз we hat у we дъчэ,
Нун чьма ha п'эжмурдэнэ?
Хвэкън р'энгэ башqэ-башqэ:
Ным р'энгэ зэр, qич'к у к'эск,
У жь дара хвэйэ бльнд
Wэрьн т'эв мън, хвэр'а бъбым.
Эзе бъбым съвък, heса,
Бе р'е—дърба, щие wе нэнас,
Кö нэбөжън жь вър wада,
Дэрхэда сöр' у сэргмада.
Бэлгед мешэ кö бъхистын,
Р'энгед нэхш-нэхш ль хвэ кърьн,
Бь свэсив у бь к'ялам,
Т'эви бе бун, ледан у чун.

BELGWEŞİN

Bê wa gote belgê dara;
Belgêd delal, geli belga,
Paiz wê hat û wê dice,
Hûn çima ha pejmûrdene?
Xwekin rengê başqe-basqe:
Him rengê zer, qicik û kesk,
Ü ji dara xweya bîlind
Werin tev min, xwera bibim.
Ezê bibim sivik, hësa,
Bê rê-dirba, ciyê we nenas,
Ku nebêjin ji vir wada,
Derheqa sur û sermada.
Belgêd mëše ku bîhistin,
Bi svesiv û bi kilam,
Tevi bê bûn, lêdan û çûn.

KURDISTAN SPOR BÛ ŞAMPIYON



Kurdistan Spor dî sala 1982'an da bî pêşen-giya çend welatparêzan hate damezrandin. Armanca damezrandina Kurdistan Sporê nasandina welatê xwe û propaganda wê bû. Lî ser singê K.Sporê ala Kurdistanê û kîncênen wan ji jî rengê netewi (sipi, sor, kesk) pêk hatiye. K. Spor dî sala 1983'an da li Stokholmê kete liga û dî koma amator ya 8'an da ciyê xwe girt. Jî wê salê şûnda navê Kurdistan Spor hatebihistin. Serfîraziya ku dî vê ligê da hate nişandan, dî nava demeke kurt da navê K.Sporê dî rojnamên Swêd da wek taximek netewi hate nasandin. Di eyni salê da K.Spor dî koma xwe da bû şampiyon û derbasi koma 7'an bû. Lê mixabin jî ber


sergêjayiyêñ dî navbera listikvanan da, ev serfîraziya hanê dî koma 7'an da dom nekir.

Piştî ketina koma 8'an, antrenor, berpirsiyar û listikvanê Kurdistan Sporê hêvi û morala xwe windanekirin û bî xebateke kollektiv cardin giraniya xwe nişandan. Îsal (1986) jî 16 maç'an 14 biserketin, 1 wekhev û 1 ji windakirin bû. Dî dawiyê da bî 29 poanan dî koma xwe da bûn yekemin (şampiyon) û derbasi koma 7'an bûn. Lî gor serastkirinê koman jî nû va, bî ihtmaliyekî mezîn ku Kurdistan Spor sala dahatû da dî koma 6'an da bilize.

Em hêvidarîn ku serfîraziya Kurdistan Sporê tim û tim bajo û her sal bîghê armanca xwe.

MAÇ'ÊN KURDISTAN SPORÊ

1— Rinkeby International — Kurdistan S	:	0—6	9— Spanga Suryoyo — Kurdistan Sp.	:	0—2
2— Kurdistan Sp. — FK Guarani	:	6—1	10— Anajenesis — Kurdistan Sp.	:	1—5
3— Ayacucko — Kurdistan Sp.	:	2—3	11— Persian Boys — Kurdistan Sp.	:	1—3
4— Bantaba Fk — Kurdistan Sp.	:	0—2	12— Kurdistan Sp. — Bantaba	:	2—0
5— Kurdistan Sp. — Pioneros	:	2—3	13— Pioneros — Kurdistan Sp.	:	1—3
6— Kurdistan Sp. — Persian Boys	:	1—1	14— Kurdistan Sp. — Ayacucko	:	4—0
7— Kurdistan Sp. — Anajenesis	:	3—1	15— Fk Guarani — Kurdistan Sp.	:	0—5
8— Kurdistan Sp. — Spanga Suryoyo	:	2—0	16— Kurdistan Sp. — Rinkeby Internat.	:	12—1



Mm ðivê aşiti, ev kevoka ciwan
Ev xweşi, raweşi, ser seraser cihan
Aşiti, dilxweşi, tim ðivê em bîvên
Gazman da nekin ê ko piştî me têñ

CIGER XWIN